

ARMANC
Ji mehê
carekê
dertê
Hejmar: 91
Nisan
1989
Buha: 10 Skr.
2.5 DM

Armananc

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 91
Aprîl
1989
Price: 10 Skr.
2.5 DM

Karkirên Tirkîyê û Kurdistanê ji kargehan daketin kolanan

"Emê Mafên Xwe Bistînin"

□ Ji dawîya Adarê û vir de ye li Tirkîyê û li Kurdistanê bi sedhezaran karkir li dijî siyaseta Ozal a ku ew birçî hiştine û ji bo meaşekî ku debara wan pê bibe daketine qada têkoşinê.

□ Li Diyarbekirê, Batmanê, Sêrtê, Mêrdînê, Agriyê û li gelek bajarên din bi hezaran karkir nêzî mehekê ye ku her roj bi tevgerên cur be cur, ji bo mafên xwe rejîma sermayedar protesto dikin.



Terora dewletê jî nikaribû pêrgî li 'ezm û têkoşîna karkiran bigre

Nûçeya wê di rûpela 2'an de

Konferansa Bremenê: ji bo piştgiriya Kurdistanê gevek xurt

"Konferansa Navnetewî ji bo Mafên Însanî li Kurdistanê"

Di Konferansê de ji 16 welatan kesên siyasî, alim, nivîskar, rojnamevan, hunermend û ji meslegên din gelek kes beşdar bûn. Ji 1000'î zêdetir kes û gelek rêxistinên netewî û navnetewî bi name û mesajên xwe ve piştgiriya Konferansê kirin

Ji alî însiyatîfa ji bo Mafên Mirovayî li Kurdistanê di rojên 14-16'ê Nisanê de li Almanya Federal li bajarê Bremenê "Konferansa Navnetewî ji bo Mafên Mirovayî li Kurdistanê" pêk hat.

Di Konferansê de ji 16 welatan kesên siyasî, alim, nivîskar, rojnamevan, hunermend û ji meslegên din gelek mirov beşdar bûn. Ji 1000'î zêdetir kes û gelek rêxistinên netewî û navnetewî bi name û mesajên xwe piştgiriya Konferansê kirin.

Li ser navê însiyatîfa ji bo Mafên Mirovayî li Kurdistanê; Rektore Politeknika Bremenê Prof.

Ronald Monch û Sertac Bucak bi axaftinên xwe Konferans vekirin û li ser armanç û girîngiya Konferansê sekinîn.

Konferans di bin hîmaya Serokê Parlamentoya Eyaleta Bremenê Dr. Dieter Klînk de pêk hat. Dr. Klînk li ser rewşa Kurdan ya Eyaletê sekinî û wiha got: "Di 40 saliya qebûlkirina Beyana Cihanşimûlî ya Netewên Yekbûyî de skandalek mezin e ku gelê Kurd di welatê xwe yê perçekirî de ji mafên xwe yê însanî tê bêparhiştin. Loma jî min qet tereddud nekir û hîmaya Konferansê girt ser milên xwe.

Di Konferansê de Parlamenterê Partiya Sosyaldemokrat a Almanya Rudolf Biding û Wezîrê Eyaleta Bremenê Volker Kroning jî li ser mafê însanî yê Kurdan axaftin. Parlamentera Komunîstê Partiya Çep a Swêd Berît Ericksson jî di Konferansê de axift. Wê di axaftina xwe de got ku li Swêdê hinêk kesan xwestin ku berpirsiyariya cinayeta Palme bikin stuyê Kurdan lê belê vê dawiyê derket ku rastî ne wiha ye. Ericksson axaftina xwe wiha qedand: "Gelê Kurdê bindest dixwaze li Kurdistanê serbixwe bi azadî bijî".

Dûmahîk r. 11

□ Serokê PDK-I Mesûd Barzanî:

"Derketina partiyên cihê tebîî ye, lê ya ne tabîî çênebûna tevkarî û hevkarîyê ye"

(Rûpel: 6)

□ Bîranînên Têkoşerekî Kurd: Ehmedê Abdurehman Axa

(Rûpel: 5)

□ Rojname û xwendevan Lewend Firat

(Rûpel: 4)

□ Fermanek nuh li Kurdan radibe!

(Rûpel: 3)

Rojeva Mehê

Nivîskarên Kurd û pîrsa zimanekî yekbûyî

Di dawîya meha Nisanê de, nivîskarên Kurd ên li Swêd bi navê Yekitiya Nivîskarên Kurd li Swêd, komeleyek ava kirin. Avakirina mûseseyekê ji bo nivîskarên Kurdên ku li dervayî welat dijîn pêwîstiyek bû. Ger nivîskarên Kurd ne bes li Swêd, li hemû welatên ku li dijî li pey vê gavê bimeşin, xwe bikin yek, komeleên xwe ava bikin, bi rastî xwedî li wan derkevin û hewl bidin da bi rêk û pêkî kar bikin, ev mûsesên wiha wê him hêz û imkana nivîskarên zêde bikin, rê li ber wê yekê vekin ku berhemên heja lêkevin ber destê xwendevanên Kurd û him ji wê xizmetek heja bikin ji bo pêşdeçûn û geşbûna ziman, edebiyat û kultura Kurdî û wê hişyarbûna milî ya Kurdî geştir û pêşketitir bikin.

Di rewşa Kurdan a îroyin de berpirsiyariya pêşîn a komelên wiha ew e ku xebatê ji bo pêşdestina edebiyata Kurdî ya milî bikin, barê çapbûn û belavbûna edebiyata bi vî rengî hildin ser milê xwe.

Lê berî her tiştî edebiyatek milî, li ser pêkhatina zimanekî milî yê edebî kare zil bide û geş bibe. Gelek mîxabin ku civaka Kurd, îro hin ji negihîştîye qonaxa pêkhatina zimanekî yekbûyî yê milî ku bersîva ihtiyaca hemû Kurdan bide. Zimanekî yekbûyî yê milî ku li seranserî Kurdistanê û li nav hemû Kurdan de xwe bi cih kiribe tune. Em her Kurd bi lehca xwe dixwinin û dinivîsin. Heta ne lehce, em bi devoka herêma xwe an gundê xwe dîaxivîn, dîxwinin û dinivîsin.

Em dibêjin em Kurd in û zimanê me Kurdî ye. Lê di rastiyê de gelo ka ew zimanê Kurdî ku Kurdên li her derê Kurdistanê tê bigihên, pê dîaxivîn, bîxwinin û binivîsin? Gava behsa zimanê Kurdî dibe, qesda me hinekan Kurdiya Başûr, a hinekan Kurdiya Bakur, a hinekan Zazakî, Hewramî yan ji Feylî ye. Heta dev ji wê yekê berdin, em hinek Soranî, hinek Babanî, hinek Botî, hinek Silivî, Serhedî, hinek Efrînkî, hinek Zazakî, hinek Dimilî û hwd xeber didin. Entabî, Adiyamanî, Serhedî û Diyarbekirî ji Botî û Behdîniyan, Dimilîyên Swêregî yan Pîranî, ji Dêrsimîyan tê nagihên. Herêma bi herêma, gund bi gund cudayeti di nav axaftinên me de hene. Me herkesî bes zarava yan devokê herêma xwe, ya gundê xwe bîhîstîye. Em nikarin bi dilekî rehet ji Kurdekî herêmekî din fam bikin. A rewşa zimanê Kurdî ev e.

Di rewşek wiha de, gelo zimanekî yekbûyî yê Kurdî yê milî û edebî kîjan e? Em Kurdên ku bi Kurdiya Başûr(Soranî, Mukriyanî û hwd) dîaxivîn, bîxwinin û binivîsin? Gava behsa zimanê Kurdî dibe, qesda me hinekan Kurdiya Başûr, a hinekan Kurdiya Bakur, a hinekan Zazakî, Hewramî yan ji Feylî ye. Heta dev ji wê yekê berdin, em hinek Soranî, hinek Babanî, hinek Botî, hinek Silivî, Serhedî, hinek Efrînkî, hinek Zazakî, hinek Dimilî û hwd xeber didin. Entabî, Adiyamanî, Serhedî û Diyarbekirî ji Botî û Behdîniyan, Dimilîyên Swêregî yan Pîranî, ji Dêrsimîyan tê nagihên. Herêma bi herêma, gund bi gund cudayeti di nav axaftinên me de hene. Me herkesî bes zarava yan devokê herêma xwe, ya gundê xwe bîhîstîye. Em nikarin bi dilekî rehet ji Kurdekî herêmekî din fam bikin. A rewşa zimanê Kurdî ev e.

Ev rastîya han berpirsiyartiyek mezin dixê ser milê nivîskar û zimanzanên Kurd. Ew ji xebateke zanistî, bi rêk û pêk ji bo zimanekî yekbûyî yê Kurd eku di çerçeva milî de di warê xwendin, nivîsandin û axaftinê de bi kêr bê.

Helbet xebata pêkanîna zimanekî yekbûyî, xebatek dûr û dirêj e, girêdayî ye bi

Dûmahk r.3

"Emê Mafên Xwe Bistînin"

Li Tirkîyê û li Kurdistanê, ji aliyê dewletê û monopolan ve kedxwiryek giran li ser çîna karkir heye. Nemaze, piştî 12'ê Îlonê ev kedxwiri hîn girantir bû. Nuha, karkir, memûr, mamoste û zehmedkêşên din çî bigre birçî ne. Di sala 1979'an de karkirek ji bo nanekî 19 deqîqe dixebitî, nuha ji bo nanekî 43 deqîqan dixebite. Ma'êşên karkiran di van 9 salên cunta faşîst de, bi awayê reel ji sedî 40 kêmbûye. Li bajarên mezin ma'êşê karkirêkî bi zorê têrî kirê dîke.

Di van 9 salan de ji ber ku sendikayên pêşverû ji aliyê cunta faşîst ve hatibûn qedexekirin, karkir bê rêxistin man. Sendîka ku ji aliyê cuntayê ve destûr standibû (TÛRK-IŞ), van 9 salên dawiyê li ber cuntayê dest dida ser hev, li ser çoka rûdinişt. Karkir di van salên dawiyê de guh nedidan serokatiya TÛRK-IŞ'ê û baweriya wan pê nedihat.

Destpêka meha Adarê, di destpêka guftûgoyên ji bo heqên karkiran de, karkiran aciziya xwe diyar dikirin, lê ji ber toz û dûmana hîlbijartinên herêmî, ev yek nedixwîya û bal nedixand ser xwe, lê piştî hîlbijartinê tevgera karkiran wek lehiyê, gurr bû, li tevayîya Tirkîyê û Kurdistanê belav bû. Serokên TÛRK-IŞ'ê ji bo ku li ber wê lehiyê neçin, qaşo wan ji qaşo biryara tevgerê dan. Dema "gihîştin" biryarê, tevgerên karkiran 10-15 rojên xwe tijî kiribûn jî.

Hukumeta Ozal li hember vê lehiya gurr, şoke bû. Rojên pêşî her çîqas gotin "karkiran pîj dikin" jî, pişt re bi serokatiya TÛRK-IŞ'ê re dan û stendin. Ozalê ku nedixwest ma'êşên karkira zêde bibe, bi gotinekê xwe da ber zêdebûna ma'êş ji sedî 100-120'î. Serokatiya TÛRK-IŞ'ê dîsa li hember dewletê "nermokiya" xwe nişan da, pêşniyara ji sedî 165-170'yî kir. Lê karkir ji sedî 250'yî daxwaz dikin.

Raya giştî di rojên pêş de ji çîna karkir tevgerên hîn xurttir dipê. Li gor beyana karkiran heta 15'ê Gulanê hukumet ber bi daxwazên karkira ve neyê, wê dest bi grewan (mangirtin) bikin.

Tevger û serhildana karkiran ji alîkî din ve jî balkêş e. Karkir bes daxwaza mafên aborî nakin, her wiha dixwazin hukumet ji ser hukum here, mafên demokratîk û azadî bi cih bibin. Di tarîxa Tirkîyê û Kurdistanê de ev cara pêşiyê ye ku karkir bi vî firehiyê û bi daxwazên aborî û siyasî serî radikin.

Tevgerên karkiran li Kurdistanê

Meletye: Di roja 12'ê Nisanê de 400 karkirên mûsesa titûnê, Fabrika Şekir, Mûsesa Avê ya Dewletê(DSİ) û Mûsesa Elektrîkê (TEK) dev ji kar berdand. Di roja 16'ê Nisanê de 600 karkirên fabrika Şekir, 750 karkirên fabrika cixarê kar sist kirin û grewa rûniştinê kirin, li otobosên serwîsê siwar nebûn. Li dijî hukumetê slogan avêtin

Erxenî: Li dor 1000 karkirên fabrika madena sifir bi meşekê piştigirîya tevgera karkiran kirin. Xelkê Erxenî bi çepika sempatî û piştigirîya xwe ji karkiran re dan xuyakirin.

Erzirom: Di 11'ê Nisanê de 7000 karkirên fabrika Şekir, DSİ û TEK

dest bi berxwedana pasîf kirin û dev ji kar berdand, derketin derve. Di 20'ê Nisanê de 600 karkirên fabrika Şekir a Îlicayê kar rawestand. Di 21'ê Nisanê de 900 karkirî meşek kirin. Di 25'ê Nisanê de karkirên sendîka Yol-Iş'ê meşek kirin.

Agirî: Di 11'ê Nisanê de 405 karkirên fabrika Şekir seet û nîvekê kar rawestand. Di 25'ê Nisanê de karkirên sendîka Yol-Iş'ê meşek kirin.

Sêwas: Karkirên madanê li qezayên Sîwasê; Divriği û Hekimxanê, karê xwe ji sedî 20'î kêmbûn.

Elezîz: Karkirên madanê car carna dev ji kar berdand. Di roja 12'ê Nisanê de 300 karkirên kromê û fabrika Şekir kar rawestand.

Batman: 550 karkirên baraja Batmanê dev ji kar berdand. Çî bigre karê barajê hatiye rewşa sekinandinê. Di roja 11'ê Nisanê de karkirên petrolê dev ji kar berdand.

Erzincan: Di 11'ê Nisanê de karkirên fabrika Şekir, DSİ û TEK dev ji kar berdand. Dîsa her karkirên fabrika Şekir, li servîsên fabrikê siyar nebûn, peyatî çûn kar, bi derengî dest bi kar kirin.

Mûş: Di 21'ê Nisanê de 700 karkirî meşek çêkirin.

Dêrsim: Di 24'ê Nisanê de 550 karkirên ku li Muduryeta Xizmeta Gunda dixebitîn, bi hev re dev ji kar berdand û derketin derve, meşiyar nav bajêr. Her çîqas polis xwest mudaxele bike jî, nikarîbû karkiran bide sekinandin.

Diyarbekir: Di 10'ê Nisanê de karkirên rê du sectan kar rawestand. Karkirên fabrika araqê ji qerara meşekê dan.

Di 11'ê Nisanê de karkirên kargehên petrolê de dixebitîn kar rawestand û riya xwe berdand. Di roja 12'ê Nisanê de 7 hezar karkirên ku di karên dewletê de dixebitîn dev ji kar berdand. Di 25'ê Nisanê de karkirên girêdayî sendîka Yol-Iş'ê tev bi hev re bi meşek çûn karê xwe û bi rê ve slogananê wek "Ozal îstifa", "Karkir dest bi dest, grewa giştî!" û "Nan, aşitî û azadî!" avêtin.

Qers: Di roja 11'ê Nisanê de li dor 800 karkirên DSİ û TEK dev ji kar berdand. Di 25'ê Nisanê de karkirên sendîka Yol-Iş'ê meşek çêkirin.

Silivî (Farqîn): Roja 19'ê Nisanê, li dor 420 karkirên tekelê (titûnê) dev ji kar berdand û tev bi hev re meşiyar nav bajêr.

Cizîr: Di roja 25'ê Nisanê de 300 karkirên komirê dev ji kar berdand û bi hev re derketin der.

Sêrt: Di roja 12'ê Nisanê de 500 karkirên rê dev ji kar berdand.

Adiyaman: Di roja 11'ê Nisanê de karkirên li kargeha petrolê dixebitîn dev ji kar berdand. Di roja 12'ê Nisanê de 100 karkir, karên xwe rawestand û bi hev re derketin derve.

Entab: Di 11'ê Nisanê de karkirên tekstîlê biryara rawestandina kar ji bo du rojan sitandin.

Nusêbin: Karkirên petrolê dev ji kar berdand û riya xwe berdand.

Bedlîs: Roja 19'ê Nisanê 140 karkirên fabrika titûnê hukumet protesto kirin.


Berxwedan û tevgerên karkiran bêyî van ciyan, li gelek ciyên din jî hatin kirin.

Pêşangehek li ser rojnamegeriya Kurd

Di rojên 20 û 21'ê Nisanê de ji bo munasebeta 91 saliya rojnamegeriya Kurdî li Stockholmê ji aliyê Komela Rewşenbîrî û Arşivî Kurd Samî Hessa weha got: "Me xwest di salvegera derketina rojnama yekemîn a Kurd; Kurdistan de, ku wek roja rojnamegeriya Kurd tê pîrozkirin, pêşangehekê vekin. Ev cara yekê ye ku li Ewropayê pêşangehek li ser rojnamegeriya Kurdî tê vekirin. Lê mîxabin gelek kes nehat pêşangehê. Em bawer dikin, heger rojên pêşangehê ne rojên kar bûna, wê bêtir temaşevan bikşanda. Ez hêvîdarim sala bê emê karibin vî pêşangehê bi awayekî hîn dewlemendtir û li ciyekî hîn baştir karibin vekin".

Di pêşangahê de ji her perçê Kurdistanê û ji her alfabe yê ku Kurd bi kar tînin (Latînî, Erebî û Kirilî) rojname nebûn. Rojnameyên kevn û yê nûh ku hîn jî derîten di pêşangehê de ciyê xwe girtibûn. Bi tevayî li dor 230 rojname û kovar di pêşangehê de hatibûn raxistin. Ji vana 180 heb orjînal, 50 heb jî kopîya bûn.

Li ser pîrsa me, "gelo pêşangeh



Redaksiyon: M. Eli, Zinarê Xamo, Hesen Mîzgin, Lewend Fîrat, Mîrza Bextiyar. Redaktorê berpirsiyar: M. Eli. Berpirsiyarê beşê Dimilkî: Mahmûsanîj

Adres : Armanç P. Box: 6004 172 06 Sundbyberg Sweden

Telex: ATTN ARMANC 11083 TELE KC Telefax: ATTN ARMANC 46-8-801825

Ansvarigutgivare: Kurdiska Demokratiska Arbetar Unionen Postgiro: 50 37 99-9 ISSN: 0348 7385

Kurdistanana Iraqê Fermanek nuh li Kurdan radibe!

Rejima hov ya Iraqî plana surgûnkirina 300 hezar Kurdî hazir kiriye

Bajarên nêzî hudûdê Kurdistanana Îranê; Qeladiz, Ranya û hinên din li gor plana diktatoriya Seddam wê bi temami bîn kavilkirin. Bes ji Qeladizê 100 hezar Kurd dikevin ber pêla surgûna diktatoriya Seddam



Gundekî ji wan 4 000 gundên ku ji aliyê diktatoriya Saddamê xwînrêj ve hatiye kavilkirin (Foto: M.Lundegård)

Li gor nûçeyên vê dawiyê ji Kurdistanana Iraqê tîn û yên ku di rojnamên Ewrûpa de cih digrin, rejima diktatoriya xwînrêj a Seddam plana êrişeke nuh li ser Kurdistanê li dar xistiye û biryar daye ku bajar, qeza û nehiyên Kurdan ên li ser hudûdê Kurdistanana Îranê ne, bi tevayî hilweşîne, bi buldozeran ji holê rake, kavil bike û xelkê wê herêmê surgûnî çolên Ereba ên germ û bê xêr û bê bike. Nûçegihan didin diyarkirin ku bi biserketina vê plana hov a dirindane wê 300 hezar Kurd tevî mîr û jin, zarok û mezin pîr û kalan ji cî û warên xwe bîn rakirin. Ev fermanek nuh e ku li serê Kurdan hatiye rakirin. Bes li Qeladizê 100 hezar Kurd dikevin ber vê fermanê.

Fermana rakirina Kurdan li Kurdistanana Iraqê ne cara pêşîn e ku derdikeve. Rejima xwînrêj heta niha gelek caran êriş bir ser gelê Kurd ê sivil û gund û bajarên wan kavil kirin, ew surgûn kirin, yan ji mecbûrî reva ji welatê xwe kirin. Piştî têkçûna şoreşa di sala 1975'an de, rejima Iraqê zêdetirîn ew herêmên nêzî hudûdê Kurdistanana Tirkîyê vala kir. Hin mecbûr man çûn Kurdistanana Îranê. Hin ji surgûnî çolên Ereban bûn. Çend sal berî niha ji 8.000 Kurden Barzanî ji cî û warên xwe hatin rakirin, hê iro ji kes hay ji aqîbeta wan nîne. Di êrişên sala par ên ji meha Sibate heta meha îlonê de ku bi tank û top û teyare û çekên kîm-

yaî, biyolojîk û napalmî hatin kirin, bi hezaran gundên Kurdan hatin hilweşandin, Helepçe hat kavilkirin, bi hezaran Kurd şehîd bûn û bi deh hezaran ji mecbûr man xwe avêtin Kurdistanana Tirkîyê û ya Îranê. Bi deh hezaran Kurd êsir ketin destê hukumeta dijmin û surgûnî çolên başûr û kampên êsiran bûn.

Armanc ji vê êrişê hov û har û ji vê fermana giştî ew e ku berî her tiştî herêmên ser hudûdê Kurdistanana Îranê û pişt re ji tevayîya Kurdistanê ji Kurdan bê vala-

kirin. Rejim dixwaze demografiya Kurdistanê bi tevayî biguhere, Kurdan ji welatê wan rake û Ereban li wan herêman bi cih bike.

Ev planeke nehiştina gel û şoreşa gelê Kurd e. Hemû hêz û kesên Kurd ên welatperwer divê bi xurtî li hember vê plan û êrişê rawestin. Ji hukumet û dewletên dinê ji Netewên Yekbûyî, rêxistinên netewî û navnetewî daxwaz bikin ku li hember kirinên rejima diktatorî ya Seddam rawestin, nehêlin ev plana dirindane biserkeve.

Danielle Mitterrand çû Kurdistanê

Xanima Serokomarê Fransa François Mitterrand; Danielle Mitterrand di 29'ê Nisanê de, ji bo rewşa Kurdistanê û gelê Kurd, bi taybetî ji ya multeciyan Kurd ji nêzik ve bibîne çû Kurdistanê. Mitterrand Xatûn wê 4 rojan li der û dora Diyarbekir bimîne. Û here kampên multeciyan Kurd ên Mûşê û Mêrdînê.

Birayara çûyina D. Mitterrand, dewleta Tirk xist panîkê. Helbet ev yek bi wan ne xweş e, lê tiştê ku karibin bikin ji tune. Lê xwestin tesîrê li programa D. Mitterrand bikin û şiklê resmî bidin ziyaretê. D. Mitterrand Xatûnê ev yek qebûl nekir û nexwest tu karbidestên dewletê di dema seyhetê de bi wê re bigerin.

D. Mitterrand wek dosteka qedirbilind a gelê Kurd tê naskirin. Di çalakîyên ji bo parastin û pêşxistina mafên demokratîk û çandî yê gelê Kurd de beşdar bûye. Mitterrand Xatûn, li ser armanca seycheta xwe, di hevpeyvîna xwe ya bi televizyona Fransa; TV 5 de weha digot:

"Bi sala ye ez mafên çandî yê civata Kurd diparêzim. Li gel vî gelî nêzikaiyeka min a hissî heye. Ez bi vê ziyaretê bersîva bangên alikariyê ku zûde ye ji multeciyan Kurd tîn, didim. Di dema ziyaretê de ezê rewş û gelşên multeciyan Kurd guhdarî bikim. Alîkariya gelên ku dixwazin hebûn û huviyeta xwe biparêzin, armanca min e".

Li Almanya şeva piştgiriya Medya Guneşî

Di 22'yê Nisanê de, li Almanya Federal li bajarê Kolnê ji bo piştgiriya kovara Medya Guneşî şevê hat amadekirin. Di şevê de hozanê gelê Kurd ê hêja Şivan Perwer û gelek hunermendên din, bi tembûr û stranên xwe, grûba "Heviya Gel" bi govenda xwe, serokê Qluba PEN'a Kurdî Huseyîn Erdem bi xwendina helbestan, rêxistinên siyasî û demokratîk bi mesajên xwe beşdarî şevê bûn.

Piştî îzahkirina armanc û programa şevê, di gel def û zirnê, koma "Hêviya Gel" hat sahnê û ji hin herêmên Kurdistanê lîstikên xweş pêşkêşî temaşevanan kirin.

Di axaftina li ser navê "Komîta Piştgiriya Medya Guneşî" de zordariyên li ser Medya Guneşî, rewşa siyasî ya gelemperî û berpirsiyariya Kurden li dervayî welat hate îfadekirin.

Sekreterê Giştî yê Partiya Pêşeng Serhad Dicle, Komîta TEGVER'ê ya Birêvebir, xwediyê kovara Medya Guneşî Cemal Ozçelik û gelek rêxistinên siyasî û demokratîk bi şandina mesajan piştgiriya xwe bi Medya Guneşî re diyar kirin.

Hunermendên Kurd Şivan Perwer, Şîrîn, Seîd Yusuf, Baran, Diyar, Cotkar, Guhdar, Temelî û hozanê Tirk Elî Esker bi awakî dilxwazî û bi dil û can ji bo piştgiriya Medya Guneşî ji temaşevanan re sitran gotin.

Bi rêvabirina tembûr û dengê hunermendê navdar Şivan merşey Ey Raqîb li ser piyan hate xwendin. Bi şiarên "Bijî Medya Guneşî" şev qediya. Nêzî 1000 kesî di şevê de beşdar bûn.

Kongra Yekem a Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Swêd

Piştî xebatek dîr û dirêj di 30'ê Nisanê de li Stockholmê bi beşdarbûna 35 nivîskar, şair û wergêrên Kurd Kongra Yekem a Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Swêd civiya.

Şairê Kurd ê bi nav û deng Şerko Bêkes li ser navê Komîta Amadekirina Kongrê axift. Ew di axaftina xwe de li ser rol û girîngiya nivîskarên Kurd ku di têkoşîn û jiyana Kurdistanê de lîstine, rawestîya û armanca Yekîtiya Nivîskarên Kurd anî zimên.

Kongrê li ser destûra Yekîtiyê xal bi xal munaqeshe kir, ji bo derxistina kovarek bi zimanê Kurdî qerar girt û 7 kes ji bo Komîta Rêvebirina karê Yekîtiyê hilbijart.

Ev cara yekem e ku nivîskarên her çar perçên Kurdistanê ji bo parastin û pêşvebirina ziman, edebiyat û çanda Kurdî yekîtiyek wiha di navbera xwe de çê dikin.

Çalakiyên Pêşmergan

Ji bona biranîna jenosîd û trajediya Helepçê, hêzeke muşterek ji pêşmergên qehreman yên Eniya Kurdistanana Iraqê ku ji du mufrezeyên Partiya Gel ya Demokrati Kurdistan liqê yekê û du mufrezên Partiya Demokrat Kurdistan -ku ji liqê yekê pêkhatibûn- di 16 -17 û 20 û 21'ê Adarê de li navça Dêrlökê qaza Amediyê, êriş birin ser çeperên(querakol) dijminê faşist.

Di êrişê de ji hêzên dijimin 37 kes hatin kuştin û 25 kes ji birindar bûn. Hêzên pêşmergan piştî êrişê gelek sileh û cepxane bi dest xistin û bêyî zayiat vejeriyan şargehên xwe.

Nivîskarên Kurd û pirsar...

Destpêk r. 2

avabûna dewleteke millî û mueseşên millî yên dewletê ji bo warê ziman, edebiyat û kulturî. Lê iro em di rewşek wisa de ne ku, em nikarin bêjin, de ka rawestî, bira dewleta me ya millî ava bibe, mueseşên me pêk bîn, paşê emê li ser zimanê yekbûyî yê edebî û millî kar bikin. Zimanê me li bin piya diçe, di bin zulm û zor û şovenizma dijminan de her ku diçe dihele, zaravên me her ku diçin ji hev dîr dikevin. Eger di warê edebî, kulturî û zimannasî de, di warê hindakariyê de em siyaseteke ji bo zimanekî yekbûyî yê giştî daneynîn ber xwe, em her kes zimanê nivîskî li ser esasê zaravê xwe pêş de bibin, emê bi xwe ji dê xizmeta wê yekê bikin ku ne zimanek, lê çar pênc ziman wê ji zimanê me derkevin. Loma ji berî ku dewleteka me ya millî çêbibe ji divê em programekê, perspektîfêkê û xebatekê ji bo nêzikkirin û yekîtiya zaravan bidin ber xwe.

Berpirsiyarên vî kari berî her kesî nivîskar û zimanzanên Kurd in. Li hundur û dervayî welat ev kar li ser milê wan e. Di rewşa iro de ku Kurdistan perçe bûye, ziman, kultur û edebiyata gelê Kurd di bin zilim û zorê de ye, qedexe ye, imkana yên hundur dibe ku kêm be, lê li dervayî welat nivîskarên me û yekîtiyên wan karin bi vî kari rabin û xizmetek gelek hêja û bi ber bikin.

Rojname û xwendevan

Lewend Firat

Di jiyana her civatê de rola rojnamegeriyê gelek girîng e. Ew li ser rewşa manewî ya mirovan û li ser şûra merivan tesîreke aktîv çêdike û bi vî hawî danûstendinên mirovan bi pirsên siyasî, bi pirsên civakî û aboriyê, bi pirsên îdeolojî û kulturê, bi pirsên îlim û teknîkê û hwd. ve girê dide. Rojnamegerî bi wan tiştan jî "têr" nabe, ji bo avakirin û eşkerakirina bîr û raya giştî jî faktor û çekek mezin e.

Ji bo wan tiştan rojnamegerî her demê û her li cihî di destên hemû çîn û tebeqên civatê de bûye sîlehek xurt û wê di dûwerojê de jî wek sîlaheke tûj û xurt bimîne.

Rojnamegeriya Kurdî jî li gor şertên objektîviya civata xwe, li gor zaniyariya rewşenbîrên xwe, li gor organîzasyonên xwe yê milî, çî di şertên muhaceratê de be û çî jî di bin nîrê mêtînghekarîyê de be, rola xwe liyistîne û dileyizin.

Wexta mirov bi tevayî û bi çavekî lêkolîngerî li rojnamegeriya Kurdî binêre merivê baş bibîne ku rojname û kovarên me di her demê de ne tenê ji bo hişyarbûna gel û avakirin û xurtkirina şûra milî her wisa di dawîya dawîn de jî gelekên wan jî bo şoreşa Kurdistanê bûne wek wasita propandayê, ajîtasîyon û organîzasyonê.

Di bin nîrê mêtînghekarîyê de rojnamegeriya Kurdî bi her hawî hat qedexekirin, xwedî û berpirsiyarên kovar û rojname hatin hepsîskirin yan jî mahkemekirin. Ev rewş li gor rewşa siyasî ya dewletên ku Kurd wek netewe di nav wan de dijîn car carna îzafî serbest bûye, lê di sa ji bi tevayî li dijî berpirsiyarên kovarên Kurdan zulm û zordarî nehatiye guherandin. Di van şertên "serbest" ên îzafî de umrê rojname û kovarên Kurdan her çiqas kin ajotibin jî, wan di hişyarbûna gelê me yê Kurdistanê Bakur de rolek mezin leyistîne.

Îsal, 91 sal derbas dibe ku rojname yekem a Kurdî; **Kurdistan** derketiye. Her çiqas tarîxa derketina yekem rojname Kurdî li Kurdistanê Başûr wek cejna rojnamegeriya Kurdî tê pîrozkirin jî li perçên din çî heyfe ku ev nebûye tradîsiyon. Malmîsanîj û Mahmûd Lewendî kitêba xwe ya bi navê **Lî Kurdistanê Bakur û li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî** jî bo bîranîna vî rojê demek berê di nav **Weşanên Jîna Nû** de weşandin. Lê belê em wek organîzasyon û pressa Kurd hîn negihîştine wê zaniyariya netewî û me ji bo vî rojê heta nûha tu tevgerê çenekiriye, her çiqas rojnamegeriya Kurdî bi tevayî jî bo pêşketin û guherandina civaka me rol listiye jî.

Îro jî di 91 saliya rojnamegeriya Kurdî de piraniya rojname û kovarên me li derveyî

Rojnamevanek yan jî kesên ku wek nivîskar di rojname û kovaran de dinivîsin pêwîst e wexta ku qelama xwe bigrin destê xwe, mesûliyeta wan wek ya doktorekî cerahî ku kêr di desta de nexweşê xwe emeliyat dike, be. Û piştî emeliyatê, wek mesûlên ku li wî nexweşî dinihêre, ji bo ku rewşa wî xerab nebe, her gav wî qontrol dike, divê wezîfa xwendevanê Kurd jî li hember rojnamevanên wan wisa be.

welat derdikevin. Rojnamegeriya Kurdî tovê xwe li derveyî welat avêt û li derveyî welat hişin tê. Çawa wexta rojname yekem a Kurdî **Kurdistan** di dawîya qirnê XIX'an (1898) de li Qahirê derdiket û bi dizî hejmarên wê li welat belav dibûn, îro jî rewşa rojnamegeriya Kurdî -piranî Kurdistanê Bakur- wek wê rewşê ye. Her çiqas îro li Tirkîyê yek- du kovarên Kurdan xwedêgiravî bi "legal" derdikevin jî vî rastiya jorîn nagehurîne. Helbet sebebên van ew e ku rewşa Kurdistanê ya îro ye. Dijmînen me yê ku li dijî kovar û rojnamevanên xwe yê pêşverû bin, ma wê çawa nebin dijminê pressa Kurdî!

Li gor lêkolînen ku li ser rojnamegeriya Kurdî hatine çêkirin heta îro nêzî 400 rojname û kovarên Kurdî derketine. Umrê piraniya wan gelek kin ajotîne. Yê din jî her çiqas xwedêgiravî periyodîk bûne jî, lê belê hema hema yek jî di wexta xwe de derneketine û dernakevin. Bê guman sebebên vî tiştî her çiqas bi sewiya tevger û organîzasyonên me ve, bi imkan û kadîrên me ve girêdayî be, hevqas jî bi xwendevanên rojname û kovaran ve girêdayî ye.

Îro problemên kovar û rojnamevanên Kurdî ev in ku, xwendevanên wan tune ne û yê hebîn jî wek ji wan tê xwestin xwedî li rojname û kovarên xwe dernakevin û wezîfa xwendevaniyê bi aktîvî naynin çî.

Di vî warî de ku meriv bi zîmanê fakta li ser vî problemê bisekine, rojname Armancê nîmûneyek e. Di 91 yek saliya rojnamegeriya Kurdî de rojname Armancê hejmarê xwe ya 91'an derdixê. Li gora şertên Kurdan ev serfiraziyek e. Ev sê sal in ku ev rojname seranser bi zîmanê Kurdî derdikeve. Her hejmarek rojname zêde zêdeyî 10 hezar kronî mesrefa wê dihere. Xwendevanên wê yê Ew-rûpa jî 600 kesî derbas nabin. Ji wan 350 kes abone ne, yê ku abonetiya xwe ya 1989'an razandine 50 kes in. Alikariya ku dewleta Swêd ji bo salekê dide heqê 4 hejmarê nake. Bawerim ev rewş jî bo rojname û kovarên Kurdan yê din ku îro li Ew-rûpayê derdikevin jî, wisa ye.

Îro li Ew-rûpayê nêzî niv milyon Kurd dijîn. Ku ji sedî yekê wan xwendevan bin, dike pênc hezar xwendevanên Kurd li Ew-rûpa. Îcar wexta fêrbûna zîmanê Kurdî tê munaqêşekirin, em dibêjin li Kurdistanê Tirkîyê zîmanê Kurdî qedexe ye, ji ber vî jî em zîmanê xwe yê zîmakî nizanin. Ma di vî warî de Ew-rûpa ne fersendek e ku em fêrî zîmanê xwe bibin, kultura xwe pêşde bibin û dewlemend bikin. Li aliyê din li Ew-rûpa ne zîlm, ne qedexekirina zîmanê Kurdî heye û ne jî kovarên Kurdan hewqas buha ne, ku neyên stendin. Sebeb di qelsiya "miletbûna" me de ye!

Rastiyek tahl e ku di dîroka rojnamegeriya me de rojname û kovarên Kurdî di warê zîman û edebiyata Kurdî de rolek mezin listîne û dileyizin; bi alikariya maddî ya dewletên biyanî wek yê Ew-rûpa derketine û derdikevin. Do rewşa **Hawarê, Ronahî yê, Roja Nû** wiha bû, îro jî rewşa **Armançê, Berbangê Roja Nû û Kurdistan Pressê** jî wiha ye.

Li ser tesîra rojname û kîjan babetên nûçên rojnamevanên Kurdî jî alî xwendevanan ve tî xwendin, bi firehî zanînek tune ye û anketek wiha jî di nava xwendevanên Kurdan de çênebûye. Lê belê him jî telefon û namên xwendevanan û him jî di civîn, şev û meşan de, yan jî di sohbetên şexsî de tê fahmkirin ku her babetê xeberên rojnamevanên Kurdî, xwendevanên wan hene. Di nava wan babetên nûçan de, bi baweriya min yê herî qels nûçên aktuel yê ku wek xeber tî nivîsandinê ne. Sebebê vî tiştî jî ew e ku rojnamevanên Kurdî piranî jî mehê carekê dertên. Ji ber vî ya jî xeberên mehan bi mahiyeta xwe xeberên "mirî" ne. Lê belê di rojnamegeriyê de "prensîbek" wiha jî heye, xeberên ku ji alî piraniya xwendevanan ve nehatine bihistin, berî mehekê jî ew çêbûbin di sa ew aktuel in.

Li ser rol û berpirsiyariya rojnamevan û xwendevanan nîmûnên jêrin bawerim di çiyê xwe de ne. Ku meriv bi mantiqa basît rojnamegeriyê bişibîne insanekî û wê, wiha formule bike: Serê insan rojname, skeleta insan nûçe û lingên insan xwendevan be; lê çawa lingên insanekî tunebe ew nikare bimeşe, rojnameyek jî wexta xwendevanên wê tunebe, ew jî nikare bimeşe. Rojnamevanek yan jî kesên ku wek nivîskar di rojname û kovaran de dinivîsin pêwîst e wexta ku qelama xwe digrin destê xwe, mesûliyeta wan wek ya doktorekî cerahî ku kêr di desta de nexweşê xwe emeliyat dike, be. Û piştî emeliyatê, wek mesûlên ku li wî nexweşî dinihêre, ji bo ku rewşa wî xerab nebe, her gav wî qontrol dike, divê wezîfa xwendevanê Kurd jî li hember rojnamevanên wan wisa be.

Stiriyên me

Lawikê Berrivani

Siyaset ne bêehlaqî ye

Di nav her sinifê, her tebeqê û her sen'etî de kesên bêehlaq hene. Carê meriv çavê xwe wiha li dora xwe bigerîne dikare jî wan kesan gelek bibîne.

Yê di jiyana xwe ya sosyal de bêehlaq be, di xebata siyasî de bi devê xwe çûka jî bigre cardin nikare biserkeve, xurt bibe. Ev yek ne bes jî bo siyasî jî bo her sen'etî jî wiha ye. Dikandarê bêehlaq, bîr û bazara wî ne xweş e; zû bi zû kes naçe ser dikana wî.

Aşxançiyê bêehlaq, xwarinên wî di çiyê xwe de dimînin; ne jî nezani û xerîbiyê be kes nare li aşxana wî xwarinê naxwe.

Qahweçiyê bêehlaq, çaya wî tim di çaydank de beyat dibe; kes naçe li çayxana wî rûnane.

Melê bêehlaq wa'zên wî çiqas xweş bin jî, di sa li cim'atê tesîrê nake.

Bi kurtayî di nav her civatê de hin normên civakî hene; ew kesên ku van norm û pîvanên civatê bidin bin nigên xwe, jî alî civatê ve "bêehlaq" tî qebûlîkin. Yanî jî alî civatê ve "afroz" dibin; êdî ne wek her endamêkî civatê ne. û hwd.

Lê heger yekî siyasî bibe ehlaq be?

Carê berî her tiştî, siyasî û ehlaq du "tiştên" wisa ne ku meriv tu carî nikare wan jî hev biqetîne. Dema yek siyasî be û siyasî bimeşîne, bi ehlaqê insanî û sinifî re, divê ehlaqê siyasî jî pê re hebe. Mesela, di tîkoşîna siyasî de ehlaqê hêzên bindest û çîna karkir tu carî rê nade derewan, sextekariyê, xeber(çêr) û cirisiyan. Ji ber ku kesên jî çîna karkir û hêzên bindest re pêşengiyê dikin, yanî kesên şoreşger, ne muhtacî derew û xeberan e. Ev her çiqas wihaye jî, lê cardin car carna di nav refên hêzên şoreşger de hin kes derdikevin, ku dixwazin siyasî ne bi fikir, bi gotinên bê edeb, bi xeberan bimeşînin. Siyasîyên wiha her çiqas wek dikandarê bêehlaq di siyasî de di demek kin de topê davêjin jî, lê heta wê rojê bi "xeberên" xwe yê bê ehlaqî gelek zirarê didin tegvera şoreşgerî. Bêyî ku zêde dirêj bikim dixwazim jî bê ehlaqîyê kovareke Kurdî numûneyekê bidim.

Ev demek e ku li Stockholmê kovarek bi navê "Demokrat" derdikeve. Vê kovarê di hejmarê xwe ya sîsiyan de di bin navê "D. Jêlî" de li ser Mistefa Barzanî nivîsek weşand. D. Jêlî dibêje, Barzanî di gotinek xwe de gotibû: "Di vî dozê de destê me yê çep jî vekiriye û yê rastê jî". Piştî van gotinan D. Jêlî gotinên xwe wiha didomîne:

"Bê guman, em zanin bê Barzanî destê xwe jî bo çî vedikir. Destvekirina wî jî bo gelê wî û welatê wî bû. Lê ew kesên ku ne di zanîna meselê de bûn digotin: "Em mesela destê çepê fêm dikin, lê mesela destê rastê çiyê, divê em wî destî jêkin. Lê piştî 12'ê îlonê, van kes û rêxistinên ku xwe li wela-tekî din yê kolonyalist girtin, li wê de jî bo xwedîkirina deh kesên xwe, ne tenê destê xwe yê restê û çepê vekirin, lê her derê xwe jî dijmin re vekirin." (Binê wê min reş kir) (Demokrat, hejmar.3 r.3)

Belê, van xebrên jorîn yekî siyasî(!) û li ser navê siyasî(!) dike. Bê guman heger D. Jêlî bi qîmeta "her derê" xwe bizanîbiya wê jî "her derê" kes û siyasîten Kurd re van gotinên bêedeb nekira. Qet şik tune ye ku yê di siyasî de xeberokî be, ew ne bes di warê siyasî de, di warê ehlaqî de jî insanekî zeif e. Ji ber ku di siyasî de xeber îspata qelsî û rebeniyê ye.

Çaxa ez zarok bûm, diya min tim jî min re digot, "lawê min, heger tu jî diya xwe hez dikî tu carî jî diya di şer de xelkê re xebera nede!.."

Wer xuyaye ku diya D. Jêlî şiretek wiha li wî nekiriye. Heyf...

Bîranînên Têkoşerekî Kurd

Ehmedê Abdurrehman Axayê
kurê Şahîn Axa

- 1 -

Şoreşa Şêx Seîd, çûna me ya Iraqê, avakirina Xoybûnê

Bi navê Yezdanê pakê di-
lovan û mîhrîban

Ezê çiroka jîna xwe ji ewelê umrê xwe heya tarîxa îro ji bo zarokên xwe binivîsim, da bizanin çawa min umrê xwe borandîye. Ez hêvî ji zarokên xwe û ji dostên ku vê çirokê bixwînin dikim ku bi çavê razîbûnê li vê çiroka jîna min birênin û ez gelek sipasî wan dikim.

* * *

Xwedê ez dam li ser dinyayê sala 1907 li gundê Şaz. Şaz jî du qebîle ne. Yek jê Barduwa dibêjinê, ya dî Saliha dibêjinê. Ez ji Barduwa me. Gundê Şaz dused mal hene. Her di nava wan de du bendî ye, şerê hev dikin. Barduwa dikarin bi Saliha. Gundê Şaz dikeve wîlayeta Sêrtê, qeymeqamiya Xaxxêrê.

Dema umrê min bû çar sal, diya min zayî' bî. Piştî wê bi pênc sala bavê min Abdurrehman Axa kurê Şahîn Axa hate kuştin sala 1916, bi destê qebîla Barduwa bi arîkariya eşîra Eruh. Her du qebîlên gundê Şaz digel eşîrek Eruh şerê bavê min û hevalên wî kirin. Panzdeh roj û panzdeh şevan, bîst mîr hatin kuştin ji her du kenara. Piştî şer sekinî Aqûb Axa serekê eşîra Eruh digel Şazîya û bavê min sulh kirin. Piştî re bi bêbextî bavê min kuştin digel mamê Îbrahîm, digel sê kurmamiyên min; Abdullah, Hamîd û Sebrî. Dema bavê min hate kuştin, çend rojekê qebîla me Berduwa poşman bûn, lê poşmani nema feyde dîke. Bavê min zilamekî mîr bû, zana ştaxalî bû, xortekî pîr sipehî bû. Serekê eşîrê bû, umrê wî 35 sal bû. Ew jî çû, ez mam bê dê û bav. Umrê min bû 9 sal, dijimîna karê kuştina min kirin da min bikujin. Zilamek navê wî Ezîz bû, kurê Remezani bû. Remezani xalê bavê min bû. Ewî nehişt min bikujin.

Dema xaleta min Xedîce; pîreka Şêx Huseyîn Şêxê Botan, kuştina bavê min bihist, jinekê rêkir pêyî min da min bibe cem xwe gundê Basret. Jinekê ez di riya adetî re rênêkirim, di nava çiya re ez birim, heya em gihîştin gundê xalê min; Dêrîşkê. Piştî re dijimîna bi dûv me ketibûn da min bikujin, lê em nedîtin. Xaleta min jî ji Basret hatibû mala birayê xwe. Em heyvekê li gundê xalê min Dêrîşkê man, piştî re em çûne gundê Basret. Ez ketim bin destê xaleta xwe, Xwedê rehma xwe lê bike, ewê ez xwedî dikirim, tiştêk ji min kêr nedihîşt. Heya ez sa-

xim ez wê ji bîr nakim. Ewê Qur'ana Kerîm jî gote min, heya min xelas kir. Piştî wê, ez dame xwendin li cem Mela Mihemed; melayê Basret. Wî dersên neh wî serfa şerîetê dida min.

Sala 1921 ez çûm Şernex ji bona xwendina ilmê dîn. Salekê ez mam, piştî re ez vegeyriyam gundê Basret, cem xaleta xwe, da li cem Şêx Îbrahîm Heqî bixwînim. Rehmeta Xwedê li ser ruhê wî bit, min li cem Hezretî Şêx Îbrahîm Heqî dixwend heta Şoreşa Şêx Seîdê Pîranî rabî di sala 1925 de. Şêx Seîd di Şoreşê de xusîrî. Tirka ew û hevalê wî girtin, şenq kirin. Piştî re Mistefa Kemal emîr kir, ku hemû meşayîxên û begewatên û axewatên Kurdistanê nefî bikin.

Dema Şoreşa Şêx Seîd, Şêx Îbrahîm Heqî xeber da hemû axewatên Botan, go emê arîkariya Şoreşa Şêx Seîd bikin. Tu kesî xwe neda ber Tirka. Şêx Îbrahîm Heqî girtin. Lê bi şev bazda di gel birayên xwe û mala xwe. Min jî digel wa bazda, em çûn Iraqê; bajarê Mûsilê. Heya em gihîştin Mûsilê me pîr zahmet dît. Em li cem hukumeta Iraqê bûn laciye siyasî.

Dema Şêx Abdurrehmanê Garisî bihist ku Tirka Şêx Îbrahîm Heqî girt û wî bazda, rabî digel eşîra xwe û eşîra Eruh şerê Tirka kirin. Leşkerê xwe kirin du perçe, hin çûn ser Dihê û hin çûn ser Xaxxêr. Dihê jî û Xaxxêr jî qaymeqamî bûn. Herdu qeymeqamî esîr kirin digel herdu qaidên cendirma. Qaidê Xaxxêr kuştin, herdu qaymeqam digel qaidê Dihê berdan. Herdu saray şewitandin, herdu deboyên ku sîleh tê de, şikandin, sîleh birin. Şerekî mezin kirin digel Tirka. Herçî leşkerên Tirka li Dihê û li Xaxxêr telsîm bûn. Lê hemî berdan, nekuştin.

Heçikê Şêx Abdurrehman bû, zilamek pîr zana bû. Dizanî herdu eşîr nikarin şerê Tirka bikin, rabî malên xwe pêşiya xwe rêkirin da herin Iraqê. Şêx şerê Tirka dikir, ewî û herdu eşîran. Heya nêzikê Zaxo dused leşkerê Tirka hate kuştin. Ji beriya malên wa bikevin Iraqê Şêx Abdurrehman çû cem mendûbê Şamî yê Îngilîzî arîkarî jê xwest.

Mendûbê Îngilîzî pîrsî gote Şêx; "şerê hewe bi Tirka re eşîretî ye yan nîzamî ye?"

Şêx jê re got; "eşîretî ye."

Gote Şêx; "eger nîzamî biya meyê arîkarî bida hewe."

Şêx bêhêvî vegeyriya ji Baxda. malên wa jî ketin Iraqê, li gundê

dora Zaxo sekinîn. Ema Şêx Abdurrehman li Mûsilê sekinî.

Piştî re min îzna xwe ji Hezretî Şêx Îbrahîm Heqî û ji xaleta xwe xwest, ez û hevalekî xwe em çûne Baxdayê ji bo ulûmê dîn. Min reşbelekê nivîsî ji bo Şêx Îbrahîmê Rawî. Vaye ev reşbelekê ku min jê re nivîsî: Ji bo kek Şêx Îbrahîm Rawî yê birêz.

Em du telebe ne, ji axa diyarê Kurdistanê hatine ji bo wê yekê ku hûn alîkariya me bikin da em ilmê dînê Îslamê bixwînin. Em hêvîdarin ku hûn alîkariya me bikin. Digel silav û îhtîraman. (Name bi Erebbî bû me Kurdiya wê li vir da. Armanç)

Dema Şêx Îbrahîmê Rawî reşbelek xwend, gote min medresek heye navê wê Medresa Rewas e. Mamhostayê wê Seyîd Xelîl e. Em çûne cem Seyîd Xelîl, odek da me û dersên me gote me. Xwarina me ji mala Şêx Îbrahîmê Rawî dihat ji me re.


Ji beriya em herin Baxda, Şêx Elî Riza kurê Şêx Seîd digel herdu birayên xwe; Silaheddîn û Xiyaseddîn ji Tirka bazdabûn hatibûn Iraqê, li cem Şêx Îbrahîmê Rawî disekinîn. Bûn laciye siyasî, hukumeta Iraqê meaş dida wan. Selaheddîn û Xiyaseddîn; herduka di Kuliya Herbî de dixwendin. Dema em ji dersê xelas bibûna, emê biçûna cem Elî Riza. Exlebê xwarina me li cem wî bî. Em gelek ji Elî Riza razî bûn, camêr bi wacibê xwe radibî. Em hîne qewmîyetê kirin.

Em mane li Baxda şeş mehan. Me dersên xwe dixwendin.

Şêx Elî Riza ji me re got; "Emê cemiyetekê çêkin navê wê cemiyetê Xoybûn e." Gote me; "ez hêvî dikim hûn herdu herin Mûsilê ji bo hûn Kurdên me yê ku ji ber Tirka bazdane û yê qeza Zaxo û Dihokê û Amediyê hîni qewmîyeta Kurdî bikin. Ji wa re bêjin wê cemiyetekê çêbe, navê wê Xoybûn e."

Me dev ji xwendina xwe berda em çûne Mûsilê, me ji wan re got; "wê cemiyetekê çêbe navê wê Xoybûn e." Kurdên li Mûsil hemû razîbûn. Ez û hevalê xwe Abdullah em çûne qeza Zaxo û Dihokê û Amediyê, me ji hemîyan re got. Gelek pê kêfxweş bûn. Me ew hîni qewmîyetê kirin, em vegeyriyan Mûsilê me cewap da Elî Riza. Elî Riza cewaba me vegevand got; "lazim e hûn mohrên meşayîxa û axewata ji wan bistînin." Me morên wan yê resmî ji wa stendin. Ez bûm wekilê Botan û hevalê min bû wekilê Behdîna.

Evaye çiroka jîna min ji ewelê umrê min heya tarîxa sala 1976



Ehmedê Abdurrehman Axa

- 1-Celadet Bedirxan Beg,
- 2-Eli Rizayê kurê Şêx Seîd,
- 3-Memduh Selîm Wanlî,
- 4-Doktor Şukrî Mehmed,
- 5-Fehmî Beg(katibê Şêx Seîd bû),
- 6-Kamil Efendî(mulazim bû li Iraqê),
- 7-Kerîm Efendî (Ew ji mulazim bû li Iraqê)
- 8-Tewfîq Efendî (mulazim bû li Tirkîyê, bazdabû çûbû Iraqê),
- 9-Haco Axa (Reisê eşîra Hevêrka),
- 10-Emînê Ehmed lawê Perixanê (Serekê eşîra Rema)
- 11-Bedredîn (Reisê eşîra hebîzbinî),
- 12-Bozan Beg,
- 13-Mustefa Şahîn (Her du serekên eşîra Beraza)
- 14-Ehmed Abdurrehman Axa (Kurê Şahîn Axa)
- 15-Abdulah Cizrawî

Me Xoybûn şekiland bi 12 izwan(endaman) sala 1928**. Piştî teşkîla Xoybûnê, Papazyan hate cem me, destê me hejand, pîrozî da me li ser teşkîla Xoybûnê. Piştî wê bi pênc rojan ez û hevalê xwe vegeyriyan Mûsilê. Me xeber da hemû meşayîx û axewatên Kurdî Iraqê û yê Tirkîyê li ser teşkîla Xoybûnê. Gelek ji me razî bûn û kêfxweş bûn; ji hemîyan bêtir Şêx Abdurrehmanê Garisî... □

Ewên me mohr ji wa stendin; Hezretî Şêx Îbrahîm Heqî; şêxê Botan û Şêx Abdurrehmanê Garisî û Şêx Abdullah kurê Şêx Mihemed Nûrî; şêxê Cizîrê bûn. Ji xeyrî wan jî mohrên axewata; Elîxan reisê eşîra Şernex û Aqûb Axa reisê eşîra Eruh û Gurgîn Axa reisê eşîra Berwarî û Îsmail reisê eşîra Giraviya û Hazim Beg reisê Zaxo û xeyre wa jî. Ev navên me gotin, me mohrê wa digel xwe hilanîn, me cewap da Şêx Elî Riza. Her tiştê digel me çêbî, di reşbelekê de me jê re nivîsî. Piştî deh roja reşbelekê ji me re şiyand, tê de nivîsî; "Hûn her du chîlê Kongresê ne. Lazim e hûn hereket bikin herin Sûryê. Haco û reisê eşîra Hevêrka, Emînê Ahmed reisê eşîra Reman, Bedredîn reisê eşîra Hebîzbinî li Qamişlî li hêviya we ne da hûn tev de herin Bêrûdê Xoybûnê teşkîl bikin. Ezê ji Bexda bê me Bêrûdê, emê li Bêrûdê hev bibînin."

Em li trumbêlê siwar bûn heya Çiftlikê. Ji wir pê de em bi lingê xwe meşin heya Çilaxê. Ema me pîr zehmet dî. Ji Çilaxê em li trumbêlê siwar bûn çûne Qamişlî, me hevalên xwe dîtin û kêfxweşî me li hev da, em gelek bi hev dilxweş bûn. Du roja em mane li Qamişloke, me tev de trumbêl girt em çûne Hisîça. Roja dî em çûne Dêra Zorê, ji bo dîtina Haco Axa*. Em çar roja mane li wê dê. Her roj mezînekê ê Dêrê em diezîmandin. Dema çar rojên me qediyay em çûne Helebê, sê roja jî li wir man. Me xeber da Beyrûdê ku emê seet heftê sibehê hereket bikin.

Em gehîştin Beyrûdê, heval li mehetê(istesyonê) li hêviya me sekinîbûn, em birin otêlê.

Sibehê em tev civiyan li mala Papazyan ê Ermenî; reisê Partiya Taşnaq. Em panzdeh peya bûn:

*Çend sal berê Haco Axa Raganê Frensi kuştibî. Ragan qaidikê leşkerê Frensa bî. Frensa ragan rê kir Cizîrê digel 100 leşkerî. Binayetik li ser girê Beyandûr ava kir, rê kir pê Mehmedê Ebas; axayê Digirê. Ragan emrê leşkerê xwe kir çalek kolan. Wî existin tê de heya qirikê, di çalê de çû rehmetê. Ehlê Cizîrê gelek tirsîyan. Ragan digel hin leşker çûn mintîqa Dicle. Tirka gote Haco; "Frense kafîr in, lazim e tu leşker bibî herî ser Beyandûr." Haco Axa meşî çû ser Beyandûr, şer kirin digel leşkerê Fransa. Dema elên sinceqa Aşîta dîtin Haco axa şer dîke, çûn arî Haco, leşkerê Fransa hin kuştin, hina bazda. Binayeta Beyandûr şewitandin. Dema ragan vegeyriya mintîqa Dicle Haco digel eşîrên Cizîrê çûn pêşiya wî nêzikî Tirbespiyê, şer kirin, ragan kuştin, herçî leşkerê pê re hemî kuştin. Ji ber viya Haco deng da. Piştî çar-pênc sala Haco bazda ji Tirkîyê hate Sûryê. Hukumeta Frensa ew girtin jê re gotin; "Te çima ragan kuşt?" Haco li wa vegevand; "Hukumeta min bî, emrê min kir me ragan kuşt. Îro hûn hukumeta me ne, hûn çî emrê mi bikin ezê ji we re bikim" Frensa Haco efû kir. (Ev bûn di nav tekest de bû me kir nota binî da qutbûnek di tekest de çenebe- Armanç)

**Rastî di sala 1927'an de ye (n. Armançê)

Mesûd Barzanî:

"Derketina partiyên cihê tebiî ye, lê ya ne tabiî çênebûna tevkarî û hevkarîyê ye"

Nûçegîhanê Kovara Medya Guneşî Ahmed Cemal bi serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê Mesûd Barzanî re hevpeyvînek kir. Em vê hevpeyvîne ji bo xwendevanên Armançê dikin Kurdî û pêşkêş dikin.

Pirs: Berêz Mesûd Barzanî, wek tê zanîn piştî rawestina şerê Îran û Iraqê rejîma Saddam ji bo ku "Kurdan qir bike" li ser hev dest bi êrîşekê kir. Di dawiya van êrîşan de tevgera welatperwer a li Başûrê Kurdistanê maxlûbiyetek eskerî jiya - ya ji paş de vekşiya - û tevger ket merheleyek nuh. Ev merhela nuh çi ye, rewşa tevgerê wê çawa be? Bi kurtayî tu dikarî ji xwendevanên me re ronî bikî?

Bersiv: Di 18'ê Temûzê de ji alî Îranê ve piştî qebûlkirina biryara Konseya Emnî ya Nete-wên Yekbûyî ya 598'a, di 19'ê Temûzê de hêzên Iraqê li hember herêmên ku hêzên me lê diman êrîşek fireh dan destpêkirin. Hêzên Iraqê ji du kolordiyên û ji boliga heştê hezar çav ku bi çekên sivik hatibûn rapêçandin teşekul dikirin. Ya din jî, bêyî alîkariya tank û topên dûrmenzîl, piştevanîyek wan a mezîna hewayî jî hebû. Biryara îdara partiyê ew bû ku li hember vê hucûmê bi şerê cepheyî bê rawestan. Me pirr baş zanibû ku ne ji alî çekdarî û ne ji alî hêza însanî ve em ne wek hev bûn. Biryara me heta dereceyekê biryarek siyasî bû. Bi vîya, me dixwest du tiştan eşkere bikin.

Ya yekê: Li derî şerê Îran û Iraqê şerek hebû ku rejimê li dijî gelê Kurd dimeşand. Bêyî vê, pêrgî lê girtina hêzên rejîma Iraqê bû. Ji bo ku berî 20'ê Tebaxa 1988'a (ev tarîx, tarîxa qebûlkirina şerrawestandinê ye) negihîje sînorên xwe yê navnetewî.

Ya duduyan: Me xwest bi dost û dijminên xe nişan bidin ku biryara me ne girêdayî kesî ye û serbixwe ye. Ji ber ku rejîma Iraqê gelek cahd kir ku têkoşîna gelê me bi şerê Îran û Iraqê ve girê bide. Liberxwedane jî penci rojî zêdetir ajot. Hêzên me derbên mirinê li hêzên dijmin xistin. Êrîş jî bo wan dageriya, bû kemîna mirinê û qet feydeyek temîn nekir.

Li ser vê, rejimê du kolordiyên din bi topên nuh techîz kir, bi çar kolordî û bi heştê boligên milîsên xulam re daxist qada şer. Vê hêzê jî tu serketinek bi dest nexist û seyra şer neguherand.

Li ser vê, rejimê bi biryarek rûreşî di 25'ê Tebaxê de li hember gundan û li hember herêmên ku pêşmerge lê bûn 200 êrîşên bi balafir ku di wan êrîşan de çekên kîmyayî jî hatin bikaranîn, pêk anî û sêceki nedîtî kir. 77 gund di yek gavê de bûn hedefên van êrîşan; diyarkirina vê bi tenê, bawer dikim ku rewşê eşkere dike. Kesên ku marûzî çekên kîmyayî bûn, pirr bûn. Bes li gundê Gelîbazî bi tenê ji 360 malbatan zêdetir ji kok de hatin îmkirin. Ji bo xelaskirina malbatên mayî, girtina tedbîrên acil hewce bû.

Nuha em zêde girîngiyê didin şerê partîzanî, xebatê dadixin nav bajaran û ehemiyetê didin firekirina qada tevgerên eskerî. Me pevçûn wenda kir, lê emê doza xwe bidomînin. Yên texmîn dikin ku wê karibin gelan ji navê rakin, dixapin.

Îro li hember têkoşîna me sê nuxtên herî muhîm hene. Ya yekê: Ji alî hejmar û qalîte ve pêşdebirin û berdewamkirina şerê çekdarî.

Ya duduyan: Ji bo yekkirina hêzên muxalefeta Iraqê (Ew, hêzên Kurd yê netewî, neteweperestên Erebb, hêzên îslamî û tevegira demokratîk in) xebatkirinek (cehdkirinek) ciddî û bi mesûliyet.

Ya sîsiyan: Di mustewa herêmê û cihanê de ji bo derxistin û teşîrkirina kirinê rejîma Iraqê (bi taybetî di roja îro de mafên însanî û azadiyên demokratîk di çapa têkoşîna cihanê de ciyekî mezîna digrin) bêtir ehmeniyet dayina xebata siyasî û propagandayê.

Em herbê naxwazin. Lê belê di şerê man û nemanê de em nefsa xwe diparêzin.

Pirs: Tu dikarî di der heqê Cephê Kurdistanê Iraqê de hinêk agahdarî bidî xwendevanên me?

Bersiv: Cephê Kurdistanê Iraqê gavên baş ber bi pêş daveje. Komîteyek siyasî û komîteyek birêvebir a Cephê heye. Her wiha buroyên xebatên eskerî û xebata propagandayê dimeşînin, hene. Bi navê Bereyî Kuristanî, organek merkezi ya Cephê heye. Cephê Kur-

distanê qezencek pirr mezin e. Em dixwazin wê biparêzin û pêş de bibin.

Pirs: Wek ku ji alî bîrûraya giştî ve jî tê zanîn li Iraqê ji bo avakirina cepha fireh xebat

Emê ji alî xwe de avakir bin. Di vê xebatê de rola Cephê Kurdistanê musbet û avakir e. Çimkî têkoşînek wê ya muteber heye.

Pirs: Wek tê dîtin di nav tev-

sê yekîtiya kar, yekbûna hêzên Kurdan em wek heqê dibînin. Li gor me jî bo xebatek wiha hîn gelek hewcedarî bi hewildanê heye. Di navbera hêzên hemû perçan de hîn gelş hene û çareser nebûne. Bi taybetî di meselên stratejîk de. Ji bo gihîştina pozîsyonek muşterek, gelşên hemû perçan divê ji navê bêne rakirin.

Pirs: Bi ya we, hêzên welatperwer ên Kurdistanê Başûr jî tercûbên xwe yê berê, bi qasî ku tê xwestin, gelo ders girtin?

Bersiv: Ji tecruba gelê xwe divê em giş dersê bigrin. Me, di nav hinekan de bi îsrar meşandina kirinê berê dît. Em dikarin vîya bibêjin ku karê bi hev re û hevkarî gavên rast in. Wek hûn dizanin hin gelş hebûn. Ev gelş ne li perçekî Kurdistanê tenê bûn sebebên şerê bi xwîn. Avabûna partiyên cihê, bûyereka tabiî ye. Lê belê dema rewş halekî belav-belaviyê bigre, divê meriv ji vî re çareyekê bibîne. Wek min gotibû, derketina partiyên cihê tebiîye lê, ya ne tabiî çênebûna tevkarî û hevkarîyê ye. Wek hûn dibînin hin gav tî avêtin. Xurtbûn û kûrbûna van gavan daxwaza min e.

Pirs: Wek hûn dizanin li Tirkiyê 40 hezar "multeciyan Kurd" di bin hoyên gelek zor de dijîn. Di rojên pêş de wê rewşa wan çawa be, ji bo başkirina rewşa wan hûn difikirin çi bikin?

Bersiv: Kesên ku îlticayî Tirkiyê kirine qîmetek wan a mezîna li ba me heye. Bi netîca daxwazî û baweriyên xwe neçûn wira. Riyek din a hellê tunebû, hukmê cografîyayê bû. Li gor agahdariyên di destê me de, şertên wan ên jîyanê û sitarê (xanî) gelekî xerab in. Bi taybetî jî yê li Mêrdînê. Meqamên Tirk, ji bo vegera wan a Iraqê zorek mezîna dide wan. Vê pozîsyona Tirkiyê ya ku li ser bingehê dijminatîya doza gelê me ye, em têdigihîjin. Li alî din peymanî emnî ya ku bi Iraqê re çekirine bi cî tînin. Em ban meqamên Tirk dikin ku divê ew bi awakî ciddî û bi sebir li ser vî siyasê bifikirin.

Li alî din meqamên Tirk rê li ber kontrol û alîkariya teşkilata navnetewî ya Xaçê Sor û Komîsariyeta Muletcîyan a Navnetewî digre. Em vê yekê wek karê nemirovî mutale'e dikin û dibêjin ku divê dawî lê bê.



Serokê Partî Demokratî Kurdîstan-Iraq Mesûd Barzanî (Foto: Armanç)

heye. Ev xebat di kîjan qonaxê de ye û wê rola Cephê Kurdistanê Iraqê di nav vî cephê de çi be?

Bersiv: Wek min di bersiva

Xebat, hewildanên mezîna dixwaze. Bi taybetî jî, dema em li tebîeta hêzên ku wê di xebatên bi hev re de cî bigrin dinêrin, ev, rind tê fahmkirin. Emê ji alî xwe de avakir bin. Di vê xebatê de rola Cephê Kurdistanê musbet û avakir e. Çimkî têkoşînek wê ya muteber heye.

pirsa yekem de diyar kir û wek di programa Cephê Kurdistanê Iraqê de jî cî digre, li Iraqê jî bo hevkarîyê fireh, xebatkirin ji vataniyên me yê esasî yek e. Heta nuha di navbera hêzên muxalefeta Iraqê de gelek hev dîtin çêbûn. Xebat baş e, wê bi xêr be. Xebat, hewildanên mezîna dixwaze. Bi taybetî jî, dema em li tebîeta hêzên ku wê di xebatên bi hev re de cî bigrin dinêrin, ev, rind tê fahmkirin.

gera Kurdistanê a welatperwer de topbûn û nêzikbûnî heye. Mesela, wek Cephê Kurdistanê Iraqê û TEVGÊRê. Hûn vê nêzikîyê çawa mutale'e dikin, bi ya we dema yekîtiyek ku

karibe hemû hêzên Kurdistanê bigre nav xwe hatiye gelo?

Bersiv: Di nav tevgera Kurd de hevkarî û nêzikîyê tê jiyandin pozîtîf e û di rîya rast de gavên pêşîn in. Em hêvî dikin ku wê netîca van xebatan serkevtî bin.

Cepheyek Kurdistanî ya fireh hedefek stratejîk e, ji bo vî em têkoşîne didin. Li ser esa-

Hewildana me ya nuha ew e, em dixwazin kontrola dîrekt û alikariya pêwîst a rêxistinên navnetewî temîn bikin. Divê meqamên Tirk bizanibin ku bi kîjan riyê dibe bila bibe, teslîmkirina wan, ya jî bi riyê zorê hewildana paşdeşandina wan, wê Tirkiyê bi mesûliyetek mezin re rû bi rû bihêle. Di destê me de agahdarî hene û em dizanin ku emê van malûmatan çawa bi kar bînin.

Pirs: Bi hatina Gorbaçov li cîhanê siyasetek nuh dest pê kir. Helkirina gelşan bi riyek aştî, vekirbûn, perestroyka û zêdetir demokrasî û hwd. Hûn wek serokê partiyekê van bûyeran çawa mutale'e dikin, tevgera Kurd ji van înkîşafan di-kare çawa feydeyê bibîne?

Bersiv: Li Yekîtiya Sovyet nuhbûn, lezbûn, hurmeta ji demokrasîyê re û firehkirina demokrasîyê di organên dewletê û partiyê de ji bo gelê Sovyetê gelek girîng e. Perestroyka wê çiqasî tesîrê li siyaseta Sovyet a derve bike ez nizanîm. Gelê Kurd ji alî her kesî ve di herêmekê hesas û stratejîk de dijî. Em hêvî dikin ku, tesîra baş li rewşa metewê Kurd bike.

Yên ku dixwazin di çerçewa cîhanê de helkirina konfliktên herêmî bi riyek aştî pêk bê, millet qedera xwe bi destê xwe tayîn bikin, demokrasî û mafê însanî bêparastin, divê ew bi awakî ciddî dest bavêjin mesala netewî ya Kurd jî. Li Rohilata Navîn çareserkirina adil û demokratîk ji bo bidestxistina mafê netewî û demokratîk yê zêdetirî 25 milyon însanî heta ku neyê dîtin li herêma aştiyek bicîbûyî(bimîne) û temînkirina îstîqrarê ne mumkûn e.

Pirs: Berêz Mesûd Barzanî, bi riyê kovara me mesajek ku tu bigihîni birûraya Tirkiyê û Kurdistanê heye?

Bersiv: Berî her tiştî bi keysgiritina ji vê firsendê, ji ewladên gelê me yê Kurdistanê Tirkiyê re û ji hêzên wan ên siyasî re teqdîr û silavên xwe dişînim. Em, ji bo ewladên gelê Tirkê dost û bira, hisên hurmet û biratiyê di dilê xwe de digrin. Ez dixwazim bê zanîn ku, emê li dijî hemû kirinên ku biratiya gelên Tirk û Kurd xera bikin, bisekinin. Divê ew jî ji alî xwe de mafê gelê Kurd ê netewî û demokratîk fahm bikin, vêya hêvî dikim.

Yên ku îlticayî Tirkiyê kirine, ku di jiyana rojane de gelek dijwariyan dibînin û tehmulê nîşan didin, ji hemû dê, bav û zarokan re silavên xwe dişînim.

Her wiha, ji birayên xwe ên ku vê kovarê derdixin re jî silavên xwe dişînim. □

Aramê Tîkran:

"Xebata muzîka Kurdî ji bo min vatiniyeke pirr girîng e"

Nûçegîhanê me yê Fransayê, E. Ronahî hevpeyvînek bi Aram Tîkran re kir. Em vê hevpeyvîne bi hêviya ku wê xwendevanên me jê hez bikin, li jêr pêşkêş dikin

Armanç: Kek Aram Kurdên Kurdistanê Tirkiyê nav û dengê te gelek bihîstine û ji sin'et û kilamên te gelek hez dikin. Lê belê ji ber gelek sebebên cihê, heta nuha îmkaniyeta hevdîtina wan û te çêbûnê û we bi hevdû re hesret derbas nekîr. Ji ber vêya jî Kurdên Kurdistanê Tirkiyê te pirr meraq dikin û dixwazin te hîn ji nêztir ve nes bikin

Aram: Ez di sala 1934'an de li Qamişloyê hatim dinê. Dê û bavê min ji Tirkiyê di sala 1925'an de derbasî Sûriyê bûn û li Qamişloyê bi cî bûn. Bavê min ji dora Sasonê, diya min jî ji dora Silîva(Farqîn) ye. Li wê derê em bi Kurdan re cîran bûn. Bavê min bi Kurmancî pirr baş dizanibû, wî, ez jî hîn kirim. Di bîst saliya xwe de bi alikariya bavê xwe min dest bi sazbandiyê kir.

Di destpêkê de min bi Ermenî distra, bavê min bêjên sitranan dinivisand, min jî ew distra. Ez Ermenî wek zîmanê dayikê li mal fêr bûm. Li Sûriyê çûm dibistaneke Ermenî, Erebi li dibistanê hîn bûm û wek min got Kurdî jî ji malbata xwe fêr bûm. Em heta 1965'a li Sûriyê man, dawiyê rîya Hayestane (Ermenîstanê) vebû, em çûn Ermenîstanê.

Armanç: Girêdana te bi muzîka Kurdî re çawa çêbû?

Aram: Wek min bîstek berê got, tîkiliyên min bi muzîka Kurdî re bi alikarî û teşwîqa bavê min çêbû. Wekî din jî dema ku em çûn Ermenîstanê piştî karê xwe ez diçûm dawetê Ermenî û Kurdan, ji ber ku min bi her du zîmana jî baş dizanibû. Dawiyê ez ketim Radyoya Erivanê beşê Kurdî û di wir de xebitîm. Dîsa bêjeyên muzîka min bavê min çê dikir. Piştî ez ketim Radyoya Erivanê beşê Kurdî alikariya helbestvan û nivîskarên Ermenî û Kurdan gelek gihastî min. Her wek Celîlê Celîl, Cîgerxwîn, Heciyê Cindî û hwd.



Dengbêjê gelê Kurd û Ermenî: Aramê Tîkran

(Foto: Armanç)

Armanç: Heta îro çend kasetên te yê muzîkê bi Kurdî derketine?

Aram: Heta îro du kasetên min yê bi Kurdî derketine, kasetaya yekem di sala 1975'an li Hayestane derket û ya duyem jî sala çuyîn bi hatina minî Almanya ji alî Komkarê ve hate zêdekirin.

Armanç: Dema ku hûn li Qamişlo bûn peywendiyên te bi hevalên din yê sin'etkar re çawa bûn?

Aram: Tîkiliyên me pirr baş bûn, me li ser muzîka Kurdî munaqêşe dikir û me tecrûbeyên xwe bi hev diguherand. Bi taybetî bi Mihemed Şexo re.

Armanç: Xebata te, bi taybetî bi kîjan zîmanî û li ser kîjan muzîkê dewam dike?

Aram: Ev pirs hindêk zahmet e, lê belê ezê disa jî bersîva wê bidim. Ji ber ku ez Ermenî me xebata min jî bê guman bi taybetî bi Ermenî û li ser Ermeniya ye. Lê wek min got, ji ber ku ez bi cîrantiya Kurdan mezin bûme û Kurdî baş dizanîm û tîkiliyên min her bi Kurdan re baş bûn û dostên min bûn, xebata sin'et û muzîkî ya Kurdî jî ji bo min vatiniyeke pirr girîng e û lazîm e ez vîya bi cîh bînim, ji ber vê îro her du xebatan bi hev re dimêşînim.

Armanç: Wek tê zanîn ji du salan û vir de ye ku îmkaniyên te yê beşdarbûna şevên Kurdên li Ewropa Rojava peyda bûne û tu li çend

ciyan beşdarî şevan bû. Îro te meraqkirin gelo bo çî berê hûn nikaribûn beşdarî şevan bibûna?

Aram: Berî her tiştî, heta berî du salan jî van welatan pirr dawetname negihştin me û rastiya wê jî, yê gihastin me jî, me nikaribû bersîvek erênî bidayê. Lê ji du salan vir de ye bi alikariya Partiya Komunîst ya Yekîtiya Sovyet û Partiya Komunîst ya Almanya Federal û dawetnameyên KOMKAR'ê ez dikarim beşdarê kêfxweşî, şahî û şevên Kurda yê li welatên Ewropa Rojava bibim(wek Almanya Federal, Fransa, Swêd) û ji bo vê jî gelek kêfxweşî im û gelek sipasî wan rêxistinanan dikim.

Armanç: Ger ji îro pê ve hin rêxistin û şexsiyetên din ji we re dawetname bi-

şînin hûnê qebûl bikin? An di qebûl nekirina dawetnaman de sebebekî taybetî heye?

Aram: Ez hemû dawetnaman qebûl dikim û hemû bi xêr bînim. Lê belê xwediyên dawetnaman lazîm e dijîminatîya Yekîtiya Sovyetê nekin û hevalbendên wan bin û karê xwe yê îdarî bi berpirsiyarên Sovyetê re ji berê de hel kiribin(ji bo derketina min a derve) wekî din tu sebebekî din ê taybetî tune ye.

Armanç: Baş e kek Aram, em ji bo vê hevpeyvîne gelek sipasî dikin û di xebata te ya pêşerojê de serfiraziya te dixwazin.

Aram: Ez jî ji bo vê eleqê û xebata we gelek sipasî dikim. □



Du dengbêjên me yê navdar: Aram û Şivan (Foto: Armanç)

Çîrok

Merivantî

Mihaîl Zoşçenko
Wergêr: Zinarê Xamo

Xalê wî serê du rojan bû ku li xwarziyê xwe Vlasov digeriya. Dawiya dawî, roja sisiyan, êdî wexta ku li ser rê bû, dikira biçûya gund, bi tesadufî rastî wî hat. Di tramvayê de rastî wî hat.

Gava xwe nuh avêtibû tramvayê, ji bo ku pera bide bilêtbir ji kîsikê xwe hîn deh kapîk derxistibû ku, bi carê de şaş bû û mit û mat ma. Biletbir jê re qet xerîb nedihat. Wek ku ji derkê wî nas dike. Hinekî din ji nêz ve li wî nêrî. Erê, rast e! Ew bû; xwarziyê wî Vlasov, wek merivekî mezin hema li hember wî sekinibû! Bûbû bilêtbir!..

Xalê wî, bi kêf qîriya:

-Weyy Vlasov, dawiya dawî ez gîham te! Ez bi çavê xwe bawer nakim, ma bi rastî tu yî, lawikê min?

Bilêtbir, bi awirekî ku bîntengiya xwe nîşan bide da ruyê xwe û qoçana bilête ji destekî xwe dewrî destê xwe yê din kir û got:

-Ez nuha tîm, mêze kim hela ka kesî din ê bê bilête heye...

Xalê bi kêf got:

-Baş e baş e, tu li karê xwe binêre, ez dipêm.

Bi kêfxweşî bû tiqê tiqê wî, vegeyriya ser rêwiyan û got:

-Ew ji nêz ve dibe merivê min. Navê wî Sergey Vlasov e. Lawê xweha min Agathe ye. Ev serê heft sala ye ku min ev bexêr nediyê...

Xalê, bi çavê heyranmayî ji nenûka heta serî, li xwarziyê xwe nêrî û dom kir:

-Ev serê du roja ye ku li te digirim, lawikê min. Min hemuyê bajêr serobinî hev kir. Tu ji li vir bûyî... Hûn ji xwe re li mezinayîya Rebê Alemê mêze kin! Ew bûye bilêtbir... Ez çûm xaniyê berê ku tu tê de rûdiniştî. Lê ji min re gotin ku tu ne li wir î. Tu nizanî ku ez çuqasî xera bûm. Tiştên xerab-merab hatin bîra min. Ez fikirim, gelo, "Teyrê me yê xerîb bi ku de wenda bû! "Dûre ji min raste rast rîya qereqolê girt. Min got, "Hûn bi qedrê Xwedê dikin ji min re bibêjin, gelo bi ku de çû? Ez xalê wî yê heq im." Lê wan ji nizanibûn ku tu bi ku de çûyî Tu nabê tu li vir bûyî... Hela ji xwe re li îşê Xaliqê mezin binêre... Hela bibêje mêze kim, bi rastî tu bilêtbir î?

Xwarzê, bîyî ku şêla xwe xera bike, bersiv dayê, got:

-Erê ez bilêtbir im.

Rêwiyan, bi dilbijokî û meraq li xalê dinêrî.

Xalê jî şîrin şîrin dikeniya û bi avirên nazik li xwarziyê xwe dinêrî. Lê belê xwarzê di rewşek wiha dijwar de mabû ku, bi pozbi-

lindiya mamûrbûnê wê çî bibêje û li hember xalê xwe wê çawa hereket bike nizanibû.

Xalê, axaftina xwe domand:

-Yanî tu bûyî biletbir ha... Hela bisekine ez wiha baş li te binêrim. Him ji bilêtbirê tramvayê ha!..

-Erê, ez bûm bilêtbir.

-Hela ji xwe re li vê tesadufê mêzeke lawikê min! Ez li tramvayê suwar tîm, carê ji mêze dikim ku tu li hember min î. Şaş dibim, ku "wiha bi carê de ji ku derket". Madem ku ez dibînim tu bûyî bilêtbir...û bi rastî ji tu bilêtbir î! Ev çî tesaduf e!..

Bilêtbir, nigêkî xwe avêt ser nigê din û bi carê de got:

-Xalo, ka perê xwe bide mêze kim... Tu diherî ku? Li ser vê, xalê dest pê kir bi heke-hek kenîya û bi henekî destê xwe li çentê xwarziyê xwe yê pera xist û got:

-Perê bilête helbet min ê bida! Lawikê min! Eger bi wasiteyek din biçuyama helbet min ê bida! Ê min ez qîmetê nadim pera-mera. Te pirsî bû ku ez bi ku de diçim; ez diçim îstasyonê.

Xwarzê, bîyî ku li ruyê xalê xwe mêze bike, bi dengêkî bê hevî got:

-Tu yê bist kapîka bidî.

Xal, şaş ma, got:

-De na lo a nuha tu rast dibêjî?

Bilêtbir, bi dengêkî nermîk got:

-Divê tu vî pereyî bidî. Tu yê bist kapîka bidî, ji ber ku... rêwitiya belaş tune ye.

Xalê, bi hêrs devê xwe kir bîzmîk û bi tehdîtkarî got:

-Çi? A nuha ji tu dixwazî xalê xwe yê heq bişêlinî?

Biletbir, bi awirên mahzûn li hewa dinêrî.

Xal, hêrs bû û got:

-Bêşerm! Ev heft sal in ku min te nedîtiye, tu ji rabûyî li hember min çî dekan digerinî?.. Cewrê kûçika, ma wê çî be! Di ser de bîyî ku şerm bikî, tu ji xalê xwe yê heq bi îsrar pîrsa para dikî. Him ji here were ji bo du pageh (seknok) wê de... Destê xwe tu çî wiha li ba dikî? Tu merivê min dibî çî dibî bibe, dest-mest libakirina te ji min re hiç e? Ya din him li hember rêwiyan wiha destlibakirina te çî ye? Nuha wexta xebêrdanê ye yanî.

Xalê, piştî ku pere di destê xwe de qermiçand, dîsa kir bîrika xwe.

Vegeriya ser rêwiyan û got:

-Di umrê xwe de we qet tiştêkî wiha dîtiye, birano? Mêrik dixwaze xalê xwe yê

heq bişêline. Bist kapîka ji min dixwaze. Ji vê re çî tê gotin?

Xwarzê bi dengêkî kelo-girî got:

-Divê ev pere bête dayin. Divê tu nexeyidî, xalo. Çimkî tramvay ne ya min e. Tramvay malê civakê ye.

Xal, bi carê de cinên wî hatin serî û got.

Malê civakê malê mivakê, wira min aleqeder nake. Te dikarîbû bi rehetî xalê xwe yê heq idare bikira. Kûçik lawê kûçik, ma wê çî be! Bi rehetî, te dikarîbû bigota: "Xalo, ew perê ku te bi hezar zahmetê qezenc kiriye, têke bîrika xwe. Carekê ji hema bê pere rêwitiyê bike." Tu dibê qey te viya bigota wê tramvay bi ser serê te de hulşiya! Çendekî berê li tramvayê suwar bûm... Bilêtbir, yekî xerîb bû, ne merivê min bû.

Min perê bilête dirêjî wî kir; hema ji min re got: "Zîrar tune ye, zîrar tune ye... Hela hûn carê rûnin.."

"Ez anîm li ciyê ku min dixwest ez dam rûniştandin... Him ne merivê min û ne jî tişkî min bû ha. Pîrr pîrr nasekî ji alî me bû. Lê tu... Xalê xwe yê heq... Na, na, tu nikarî ji min pera mera bistîni!"

Biletbir, bi milê çakête xwe eniya xwe pa kir û di ci de li zilê xist.

Tramvay sekinî.

Bilêtbir, bi awirekî pîrr resmî got:

-Ji kerema xwe re dakeve, xalê minî delal.

Xalê, dit ku mesele li cid-diyetê suyar bû, milên xwe ji bêçaretî bi her du aliyan ve vekir, ji kîsikê xwe pere derxist, lê dûre cardin xist hundir.

Ji hêrsa xwe bi pelte pelt got:

-Na, na, ez pere mere nadim! Pênc pera ji nadim te! Çilmo... Tu bûyî bilêtbir qey tu xwe gûyekî dihesibîni! Ezê dakevim hîn baştir e.

Xal, bi kerb bi alî derî ve zivirî.

Bi carê de di ciyê xwe de sekinî.

Ji hêrsa qîriya û got:

-Xalê xwe... Tu xalê xwe yê heq davêjî derva ha!.. Ezê viya rê te bidim; ya ya gidî bê edeb!.. Hesabê vê yekê helbet ezê ji te bipirsim. Gidî bînamûsê durzi!.. Bila Xwedê şahidê min be, ezê te bidim gulebarankirin.. Li Smolnî nasên min ên baş hene. Di nêz de tu yê bibîni dinya çend perçe ye... Carek din vegeriya, piştî ku awirekî tûj da xwarziyê xwe, ji tramvayê daket.

□

Ji 'Edetên Kurdan

Berxşo

Perwîz Cîhanî

Karekî herî bingeşîn ku li seranserî Kurdistanê, bi taybetî jî di nav gundî û koçeran de heye, pez xwedîkirin e. Piraniya karan di nav gelên dunyayê de, xwediyê rê û dirb û adetên taybetî ne. Yanî ji alî rêkêta wan karan an bidest-xistina berhemên wan de rê û aweke taybetî dadimezire. Her wekî adetê "beranberdan" an "pezbîr" ku di nav Kurdan de heye. Yan "cejna tîr" ya di nav *Asûriyên Îranê* de ku di wextê gihîştina tîrî de tê lidarxistin. Di vê gotarê de me divê em adeta "berxşo" bi xwendavanên hêja bidin nasîn.

Nava havînê ku derêca germê digihê nuxta herî jor, xwedîpez xwe ji bo birrîna (qusandina) hirî yan liva ya (libaya) berxan hazir dikin. Berx, di wê demê de ku pênc şeş mehî ne, ji keriyê miyan cudakirî di wargeyekî taybetî de tîn xwedîkirin.

Çend roj berî "berxşo"yê, şivan û berxvan heqê şeş mehên xwe ku bi pirranî di wextê heqbirrînê de "berx" an "kar" hatiye tespîtîkirin, ji xwedîpezan werdigirin. Piştî temambûna heqwergiritinê, wextê şuştina berxan e. Roja şuştina berxan, bi navê roja "berxşo" navdar e. Xwedîpez hemû di vê rojê de li rex cuh, kanî yan obê (warê koçerî) dicivin û bi çîm, xwelî û beran (kevîran) bendekê li pêş avê dibestî. Ava cuh û kaniyê li pişt bendê pingar dide û kûrtir û pirtir dibê. Helbet di birrek herêman (navçan) de ji tavge û delavên tebîî yan destkir (sun'î) fêdê digrin.

Wexta şuştina berxan, çend kes ji şivan û berxvan û xortên ciwan diçin nav avê, çend kes jî berxan davêjin ser destê wan û dest bi şuştina berxan dikin. Bi şuştina berxan re dilok, sitran, helbest û lawik jî tîn gotin. Kêf û laqirdî û henek jî her bi ber kar re dimeşe. Berxşo, bi yekdengî gazî dikin: "Hezar kirrî, hezar birrî!" Mebesta (qesda) wan ji vê ristê ew e ku xwediyê wan berxan, salê hezar berxê xwe bi birre û hezarî jî bikirre. Ev, cureyekî dua ye. Di vê rojê de zarokên avayiyê yan obê (obayê) ji hemuyan şadîr û kêfxweştir in. Kevanî jî karekî wan ê dike heye. Ew divê ku ji bo berxşoyan helaweke taybetî ya bi navê "mirtoxe" çêkin. Mirtoxe, helaweke taybetî ya roja berxşoyê ye ku ji ardê (arvanê) genim, rûnê nîvişk, dims (mot, doşaw) yan şekir pêk tê. Ev helaw buye xureke (xwarineke) sunnet...

Her mal, divê di wê rojê de mirtoxê çêkin, yan na, ji wanşîrê ku her mala ku mirtoxe çêneke berxên wan rastî nexweşiyê tîn û hilak dibin.

Ji wê mirtoxê didin hemû wan kesên ku di berxşoyê de beşdar in û temamê yên ku li wê ne û her wisa rêwiyên ku di wir re derbas dibin. Dibên ku parvekirin û belavkirina mirtoxê di nav daniştvanên avayiyê yan ji obê de, dibe sebebê bidûrxistina qeza û belan ji wan û berxên wan. Ji bo wê jî gelek bi îsrar in li ser çêkirin û belavkirina mirtoxê. Her sal di wê rojê de bivê nevê, divê mirtoxe hebe.

Berx ji bo du mebestan tîn şuştin: mebesta yekê ji şuştina berxê ew e ku liva berxan temîz û paqij bibe.

Ya duduyan jî ew e ku şuştina berxan dibe sebebê windabûna nexweşiya berxan û her wiha ji navçûn û qirbûna gene û qijnikan û sipiyên li ser laşê berxan.

Piştî şuştina berxan, wan li wargeyekî beroj dihêwirînin da ku liva û hiriya wan hişk bibe. Roja birrîna berxan, berx li wargeyekî nêzî avayî yan obê tîn civandin. Piraniya xwedîpezan bi xwe dikarin hirî yan liva berxan bibirrin. Eger kesê ku nizanibe vî karî bike ji yên şareza alîkariyê werdigire. Ji yên ku di vî karî de şareza ne re "birîngbîr" yan "qusêsi" tê gotin. Birîngbîr bi meqesêke taybetî ya bi navê "birîng" ya "hirîbrîng" ku piranî bi zaravayê Kurmanciya jorî "herbing" (hevrîng) jî tê gotin, hiriya miyê yan liva berxê dibirre.

Wexta birrîna berxê yan miyê her çar lingên wê bi benekî taybetî yê bi navê "pêpez" yan "pêbênd" girêdidin ji bo ku berx yan mîh xwe nelivîne û karê birîngbîr hêsatir be

(Ji Sirwe: sal 3, hejmar 14)

ne karê aqila ye lê rast e

◆ Dinya li dora rojê di salekê de digere. Di vê gera dinê de sur'eta dinê di saniyekê de 30 km an jî di saetekê de 108000 km ye. Di salekê de دنیا li dora rojê 940 milyon km diçe.

Planeta Mercurius jî dinê bi leztir e. Sur'eta wê di saetekê de 173 000 km. ye. Planeta Pluto pirr giran digere, di saetekê de 17 000 km. rê distîne. Saturnus a herî bi leztir e. Di saetekê de 172 248 km. rê diçe.

◆ Li Amerika 2 milyon karkir 10 milyon otomobîlî çêdikin. Li Japonya-yê 670 000 karkir 11 milyon otomobîlî çêdikin.

◆ Ku mirov di saniyekê de reqemêkê bijmêre, jimartina heya milyonekî 11,6 rojan digre. Lê jimartina heya milyarekî 31 sal û 252,1 rojan digre.

◆ Ku mirov di saetekê de 10 km. bazde, bazdana dora dinê li ekvatorê 173 rojan digre.

◆ Mêjiyê jinan jî yê mêran siviktir e. Mêjiyê jinan 1265 gram û yê mêran jî 1424 gram e.

◆ Hemû hereketên laşê mirovan jî alî 639 kejiyan (kas) vê tînen lidarxistin û ev keji jî %40 giraniya laşê mirov in.

◆ Li Britanya Mezin şirketa Locronic bi sistemeke nuh dikare di deqêkê de 1800 fringî(bacanê sor, şamik) û 3000 kartol bineqîne. Fringî û kartol jî alî kamera -TVyekê ve tînen nîqandinê. Kamera- TV resmên fringî û kartolan dikşîne. Resmê her fringî û kartolekê jî datayê derbas dibe. Fringî û kartolên ku ne li gor koda di datayê de ne tînen hilbijartin. Ev sistema han dikare dereca gîhiştina fringî û kartolan jî tespît bike.

◆ Laşê mirov jî nêzî 100 trilyon hucre hatiye avakirin. Û di laşê insan de nêzî 5 milyon mû hene û jî van nêzî 100 000 mû di serî de ne.

◆ Doktorên dermanan bi bakteriye-ke taybetî dikarin 'ewr biguherînin baranê. Heya nuha teknîka han jî bo 'ewrê germ derbas nedibû. Hin lêkolînerên Îsrailî jî bo vê jî çare dîtine. Pêşî bi hin bakteriyan taybetî 'ewr dimezînin û pişt re jî hin maddeyên kimyayî li ser 'ewran dîreşînin û 'ewr diguhere, baran dibare.

◆ Di xwina mirovan de ya ku oksîjenê di laşê mirov de digêre hemoglobîn e. Komek lêkolînerên navnetewî tespît kirine ku hemoglobîn di kokên hêşinayîyan de jî heye û li gor texmîna wan, karê gerandina oksîjenê hemoglobîn dike.

◆ Labîranta herî mezin li Britanya Mezin e. Bi tevayî 2, 72 km. dirêj e.

Hindik-Rindik

Ker

Apê Çûço bi cibê diçû gund. Nêzî nav xirbe, kerek derket ser rîya wan. Ker di orta rîyê de sekinî û qet xwe tevneltvand. Şofêr çûqa li qornê xist jî kerê xwe neda alî. Apê Çûço bala xwe dayê ku wîha bi reheti ker xwe jî ser rîya wan nade alî. Ji cibê xwe çindî jêr kir û berê xwe da kerê. Ji pêş ve bi her du guhên kerê yê şekalî girt, serî jî hinekî bilind kir û mirç û mirç.... çend caran eniya kerê maç kir û got:

- Ez bi qurbana wi bîrî ye ku navê te kirîye ker...

Te got çî ?

Mehdî Zana her cara ku derdikeve mahkemê, parastina xwe bi Kurdî dike. Û mahkeme jî vê yekê qebûl nake, dibêjin hutul-batîl tu yê bi Tirkî bipeyivî. Mehdî jî dibê na, ez Kurd im û zîmanê min Kurdî ye; mafekî min e insanî ye ku ez bi zîmanê diya xwe bipeyivim. Di navbera Mehdî û mahkemê de ev munaqesê bi vî hawî dom dike. Ji rojan rojekê, hakim jî Mehdî re dibêje:

- Mehdî, tu bes bi Tirkî bipeyive, tu çî dibêji tu serbest î. Û wext jî jî te re bê sînor e.

Mehdî wek her tim, cardin qebûl nake. Mahkeme dest pê dike. Hakim bi konetî, bi Tirkî jî Mehdî dipirse:

- Babanin adi Hilmi degil miydi? (Ma navê bavê te ne Hilmi bû?)

Mehdî carê gotiye na, ma qet bi Tirkî bersivê dide.... Bi Kurdî bersivê didê:

- Te got çî?

Li ser vê bersiva Mehdî, mahkeme van gotinên jêrin derbasî zebtê dike:

- Girtî bi zîmanekî nayê fêmkirin peyivî, divê jî salone bête derxistin...

Hunerê Pîcassoyê mezin û mirovatiya bindest

(1881-1973)

J. Kurdo

Ji sala 1900 heta 1905 rengên tabloyên Pîcasso zêdetir rengên hêşîn yan jî rengên nêzîkî hêşîn bûn. Temayên tabloyên wî xem û diltengiya jiyana mirov bûn û çarenûsî di wan de ne diyar bû, zêdetir bêdaletiya çîneyetî dianî zîman.

Di sala 1906'an de rengên tabloyên Pîcasso ronîtir û germtir bûn. Mirovên tabloyên wî jî mirovên negatîf bûn mirovên pozîtîf û di wan de gelek hêvî peyda bûn. Ev tişt jî bi çakî pêşveçûna bîriya (fîkrê) hunermend nîşan dide. Ji bona xwe û jî bo hemû mirovatiya li rûyê cihanê bi hêvî ji bona jiyaneke baştir xwe dibîne.

Hunerê Pîcasso proseseke dûr û dirêj bû. Pîcasso bi xwe du çavên wî yê reş û mezin hebûn ku wî tim ew li dû teknîka wênêkêşî, cuwanî û naşîrîni jîyan digêrand. Ev beşek bû di prosesa katagoriyê de. Cihanek aştî û azad jî bo hemû mirovatiyê daxwaza Pîcasso bû. Lê belê Cenga Cîhana Yekem a împeryalist gelek hevalên Pîcasso yê hunermend di agirê xwe de şewitand. Piştî cengê mercên bîr û baweriyên insanî xurt bûn û pêş de çûn. Di vê demê de Pîcasso kesekî mihacir bû jî Îspanyayê hatibû li Parisê bi cî bûbû, pirr feqîr bû. Lê belê alîkariya rewşenbîrên Fransa jê re deriyekî mezin jî bo dahatuya wî vekirin.

Hewcedariya civata kapîtalîzmê ya nuh bi kultureke nuh hebû. Û

vê prosesê jî berî hatina Pîcasso destpê kiribû. Li Fransa xeta Kubîzmê di hunerê risim de wek formekî taze bi destê Sîzan dest pê kiribû. Pîcasso raste rast tevî vê prosesê bû. Ji ber ku Paris di vê demê de merkeza huner û kultura hunerê cîhana nuh bû.


Pîcasso umrê wî 25 salî bû wexta tabloya xwe ya herî nuh temam kir, ku bi eşkereyî tesîra Kubîzmê û ya hunerê Afrîka tê de xuya dikir. Navê vê tabloya Pîcasso Xanimên Avignon(1907) bû. Pîcasso bi vê tabloyê li Fransa û cihanê gelek deng da. Çend tendensên nuh di kultura Ewropa de peyda bûbûn; wek Dadaîzmê, Surrealîzmê û Freudîzmê. Û gelek helbestvanên wek Rambo û Apolonger, gelek kompozîtorên wek Stravînskî, gelek diramatîkarên wek İb-sen û gelekên din jî bo durusbûna şexsiyeta Pîcasso faktor bûn.

Li Paris hemû tabloyên Pîcasso dihatin firotin aristokratên Amerîkî û Ewropî. Sipas jî bo Paris ku ev lawê feqîr Pîcasso jî birçîbûnê rizgar kir.

Carekê rojnamevanekê diçe atolya Pîcasso, dibîne ku waye barek boyax li wir e. Rojnamevan dipirse: Hewqas boyax jî bo çî te daniye vira? Pîcasso dibêje: Ji ber ku çaxa ez zarok bûm, perê min tunebû ku ez boyaxê bikirim, lema nuha hewqas çavbirçî me.

Pîcasso numuneyeke mirovê serdema me bû, jî ber ku mirovêkî pozîtîf bû û li ser hemû prob-

lemên insanî înterensa wî hebû. Wexta Almanya di sala 1937'an de bajarê Guernîca welatê Baskan li Îspanyayê bombarduman kir Pîcasso li Paris aware bû. Ajansên cihanê di deng û bahsên xwe de jî her alî de belav kirin ku di 26'ê Nîsana 1937'an de balafirên cengê yê Almanya Hitlerî bajarê



Guernica, 349,3 X 776,6 cm. (1937)

Guernîca bombarduman kirine. Ev bajar, bajarekî merkeza kulturî ya kevn e Baskê bû. Rûniştvanên bajarê nêzî 70.000 bûn. Jimara balafirên ku bajar bombarduman kiribûn pirr bûn, nêzî 3,5 jî nizmî bombe bi ser miletê vî bajarî de barandin. Netîce, bi hezaran zarok, pîrek û kal hatin kuştin û bi hezaran jî birîndar bûn. Vê trajediyê hurmeta burjuwaziyê Alman xist bin nigan û nefreteke pîroz

xist dilê hemû kesê li rûyê cihanê. Netîca Guernîca jî her kesî bêtir li Pîcasso tesîr kir. Ji bo tolgirtina (heyfgirtina) jî ceng û faşîzmê û bazirganên çekan, Pîcasso bi navê Guernîca ew tabloya xwe ya mezin çêkir. Vê tabloyê li hemû cihanê pirr nav û deng da. Li cihanê bû sembola aştiyê. Ji ber ku di dema împeryalîzmê de tabloya yekem bû li dijî cenga insan li dijî insan. Û her wisa yekem tabloya cihanê bû ku li dijî kuştina bajarekî bû. Guernîca bajarekî wek Hiroşîma Japon û Helepça Kurdistan, bi seroktiya rejîma sermiyandariya cihanê jî bo ceribandina çekên nuh û jî bo

karê we kiriye, min jî bo tarîxê di vê tabloyê de nîşan da".

Bi vî rengî Pîcasso wek dêwekî efsanewî yê kevn e Derya Spî ya Naverast li dijî ceng û zordariya rejîma sermiyandariyê serî hilda. Bi vî karê xwe jî, bû hunermendê cihanê yê yekem.

Piştî Şerê Cihanê yê Duyem û şikestina faşîzmê, Pîcasso du tabloyên mezin çê kirin jî wan yek bi navê Aştîyê û yek jî bi navê Cengê. Sala 1951, wexta rejîmê sermiyandar ên Ewropa û Amerîka bi tonan bombe bi ser miletê Korê de dibarandin Pîcasso bi tabloyek mezin li dijî vî jenosîda miletê Korê derket û împeryalîzm

rûreş kir.

Navê Pîcasso bûye sembola aştiyê jî bo hemû cihanê. Pîcasso pûl û afîş jî bo aştiyê çê dikir û di hemû kongrên aştiyê de beşdar dibû.

Pîcasso, di sala 1973'an de di temenê 93 salî de sibakê jî xew ranebû û heta heta jî mirovatiyê xatir xwest. Nuha jî hewcedariya însaniyê gelekî bi kesên wek Pîcasso û mirovatiya wî heye.

Lawikanê Dêrsimî ra

Arêkerdax: Firat

Na Feqîrenî

De bira, ez o se kerî, senî kerî?
Ardê min qediyê, nêzan (nuzon) se bikerî.
Bira, roze- di rozî (rojî) nîyê, der- cîrano ra dên kerî;
Sere- di serî nîyê ho (xo) rê morabayên bikerî.
Wax lemin derdo, lemin keko, wîy lemin derdo!

Cinike vana:- Mordmek, mi çal sano rû;
Afken tey çîno, ara **soder (sodir)** rê se bikerî?

- Erê tu meraqû meke,
Ez o sonû ocaxû ser uskûrê dên kerî.
Wax lemin derdo, lemin keko, wîy lemin derdo!

Mordmek vano:- Cînik, **tu (ti) bê haqa ho mi ra**
helal ke.

Çor bizê ma estê, berî biroşî,
Çor qurusû cêbê ho kerî, ho rê welatû ser şêrî.

Cinike vana:- Mordmek, tu ke son Qeyserîye,
Tu Tirkî nêzana, ho biçarne Qoçgîrîye.
Wax lemin derdo, lemin keko, wîy lemin derdo!

Cinike vana:- Tu ho rê helal **can** bide,
Ez warê to **piyeno (pînû)**.
Lazê to beno pîl, benê eskerîye.
Qomandan **mowa (mawa) dey** ra kifîrî keno,
Ho rê vilê ho çot keno, ver de vindeno.
Ho rê Tirkî nêzano.
Wax lemin derdo, lemin keko, wîy lemin derdo!

San

Bira, Şîrame ver de lemin, keko lemin!
Sanê mi **lewa (leya)** teke.
Torna Kerîm Axay to rê hewnê diyo, vana:
"Linga ho zengûyê mayine meke!"
Bira yê sarî hîre û çar î
San'î ser o berbena tek jû çêneke.
De bira va bo **ge (ke)** va bo,
Ez bîtersî felek bêro ma rê meyman bo

Bira, Qozû ver de, Sanê mi, tum û vamî.
Seydxan vano: "Der û cîran, bêrê pê ser wûy!
San mi ra **herediyo (miradiyo)**,
Temel sano hardê xamî"

San vano: "Apo, tu meraq û eftar **meke**,
Ho kerdo na raye neçe cenc û neçe fidanî."
De bira, va bo ge va bo,
Ez bîtersî felek bêro ma rê meyman bo.

Bira, Qozû ver a, Sanê mi, herxa vaye,
Berjenê San de ništa rû, berbena Henika maye.
Seydxan vano: "Elçiyê birusnê, bêro" mi va
"Anika waye".

Sanî goça ho na **piro (puru)** koto raye.
De bira, va bo ge va bo,
Ez bîtersî felek bêro ma rê meyman bo

* Hardo xam: 'Erdo (Hardo) nêramite, 'erdo ke te de cite
nêbiya. Tiya de ci ra qest cay mezeli (tirbi) yo.

Xaçeliye

Bira, Xaçeliye* biveso, lemin, lemin derdo!
Alî Heyderê mi, xave (**xavi**) şûye.
Vanê qursunê gina Alî Heyder'î
Lemin derdo, lemin keko, lemin!
Jara (Jiyara) Surûze belî biye,
Qesu pûşîya Alî Heyder'î, leminê keko!
Mi va Derê Kalon ra şîye.
De way leminê, derdo way!
Alî Heyder'î ser o berbenê mi va çutê wayî.
Ximalê çerxa dîna gewre!
Wî leminê bawo, wî leminê derdo, wî leminê keko!

Bira, Xaçeliye biveso!
Alî Heyderê mi, vala (viyala) reze,
Vanê dirbetîya **ho (xo)** xorî ya
Dirbetî ya Çêna Xidê Nazê**.

Bira, Xaçeliye biveso!
Alî Heyderê mi, kemerê ajî.
Vanê emser kişîyo Alî Heyderê wayîrê mawzerî.
Alî Heyder vano "hêfê mi ke cênê, kisenê;
Bikisê jîvegê Qere Silêmanî."
Alî Heyder'î ser o berbenê çutê wayî

* Xaçeliye: Yew (Jû) dewa Xozat'î ya. Dewleta Tirkan na-
mey na dewe kerdo Dikenli.
** Çêna Xidê Nazê: Cînika Alî Heyder'î ya.

Vanê cay di, wextê di pa-
dişayekî û wezirê xo bi. Ro-
cî veciyay sûk ra teber. Sûk
ra veciyay ki jew kalikê ha
ronişto. Şîy va:

- Silamû 'eylekum.
Va: 'Eylekum silam.
Va: -Ti yê se kenî?
Va: -Ez aqil roşena
Va: -Ti aqil roşenî?
Padişaya rawêrt, Wezirî va
"vindi ki ez xo rê aqil bigî-
ra".
Şî, va: -Dedo, aqilê bidî
mi.

Va: -Aqil bêpere niyo! Hi-
rê altûnî ti do bidî, ez aqil
to da.
"Aha" va "to rê hîrê altû-
nî!" Hîrê altûnî day ci.
Kal hima bi koktê welli
ro, va:

-No jewî sere bo ki sîrrê
xo kesî rê vano.
Wezirî fina abirriya, "la"
va "no **tu** aqil niyo, fina şî-
ra jewna bigîra".

Şî, va: -Dedo, mi rê aqil
bidî.
Va: -Winî bêpere niyo, bi-
di hîrê altûnî!
Altûnî day ci.

Va: -Aha no zî jewî sere bo
ki qewmdê xo ra abirriyo,
zoybî merdima ra **şiro**.

Va: -La no wina mi zî za-
naynî! Fina ez şîra ey zî
bigîra.

Şî, va: -Dedo, mi rê aqil
bidî.

Va: -Peranê xo bidî.
Hirina altûnî day.

Va: -Ha no jewî sere bo,
merdimî ki merdimê huk-
matî ra bawer beno.

Aqilê kalî qediya. Wezirî
nayo rayir, şî pey ra resa
Padişay.

Padişay va: -To se kerd?
Va mi rê hîrê hemey wina
wina va.

Va: -Rind o.
Fina şî, geyray. Eger din-
ya di çendî geyray se gey-
ray, çend mangan ra tepya
fina egeyray saray.

Saray di **kavirekî** Padişay
esto. Kavirekî sava,
werdî yo. Tim û tim qeç-
kan ra pi ya şîno bexçe.
Weyniyay ki kavir Padişay
rê bol qedr o, Wezirî va

"vindi ki ez tecribey nê
aqilî kera, hela rast o rast
niyo". Şî yû kavirekî tirit û
girot ard nimit û şî jewna
kavir girot ard, qotê ci
kerd, ven da cenêrda xo, va:

-Cenêki, bê! Mi kavirekî
Padişay tiritto. Ma **qotê ci**
kerê, xo rê bûrê.

Cenêkerî "ey" va "rind o".
Cenêkerî ra piya şîy, ka-
vir qotê ci kerd, poste kerd,
goştê ci werdî kerd, na ser
werd. A **rojî** Padişay delal
dawo ven da:

-Kavirê mi kotî viciyo se
ez do 'idam kera! Biyarê!
Rocî, didî, hîrê, delalî ven
da, ven da, kavir çîniyo.
Mend. Hîrê rocî ravêrtî tep-
ya se Wezirî va:

-Cenêki mi rê tasê aw
biya.

Cenêki **nêruway**.
Va: -Cenêki tiya ez to ra
aw wazena! Ti çiçi **nêruwe-
na?**

Cenêki va: -Ti çi rê pêtê xo
anê?

"-Liya" va "mi rê aw biya!"
Werişt çîwey vist ci. Ha-
ma cenêki xo verra da şî
huzirdê Padişay, va:

-Padişay mi, Ella 'umrê to
di bo. Kavirê to Wezirî tiri-
to, qotê ci kerdo, werdo zî.
Padişay hama derhal
hendo ki hêrs biyo, idamê
Wezirê xo vet. Fermanê ci
ard.

Wezir ame ki şêro saray.
Senê ki şî se hama tepîştî
yû fermanê ci kerd mil û
va:

-Ney berê dar di kê!
Girotê ki çarşî ra berdê
dari ver se, hemeyê ahaliyê
çarşî arê biya dim a wu-
niya, va:

-Wax wax, Wezirî benê dar
di kenê!

Tanîni va: -Kavir tiritto!
Tanîni va: -Heyf ci rê!..

Birazakêndê Wezirî estî-
bî. Wezirî biray xo dew ra
qewirnabî, biray ci wuca di
hemaley kerdbî û merdbî.
Birazayênê ci **estbî**, va:

-No çiçi yo wina?
Va: -Wezirî benê dar di
kenê!

Va: -La Wezirî dedê min o,
qandê çiçi?

Va: -Kavirê Padişay tiri-
to?

"-La" va "kavirî ez şîra
Padişay rê bigîra!"

Şî, va: -Nika ez kavirî bi-
da nêbeno?

Va: -Nê!
Va: -Didinî?

Va: -Nê!
Va: Desinî?

"- Nê" va "ti seyini zî bigî-
rê nêbeno, îlla do Wezirî
dar di kerê!"

Ageyra, tesliya ci kewti.

Dim a vazda şî ki berdo
dari ver, kendirê ci zî hazir
kerdê. Wezirî rê va:

-Vatişê to esto?
Va: -Ney.

Va: -Winî yo se kendirî
b'erzê **qirri!**

Kendir kerd Wezirî qirri
se nê birazay ci xo eşt û
kendir girot û kerd xo qir-
ri. **Cellatka** kardî eşti ken-
dir, nêverda.

Fina viraştê, fina kendir
berdê kerdê qirri, fina bi-
razay kerdê xo qirri.

Biraza vano "ver a Dedi
mi dar di kerê". Hîrê finî
eşt xo qirri û visnay welha-
sili.

De Wezirî zî va ki "Padişay
yo, senê bê ifade kesî dar di
keno?"

Xeber day Padişay. Padişay
va:

-Rast vato. Winî yo se ina
(inan) biyarê!

Şîy, Wezirî û biraza ardê.

Padişay Wezirî ra va:
-La ti yê se vanê? Qey to
bêbextiyê kerdî mi, kavirê
mi tiritî?

Wezirî va:- Hal-mesela
winî ya: mi aqilê kalî ce-
rebney. Heme zî rast vi-
ciyay. Ê verênî: mi sîrrê xo
cîniya xo rê va, a zî amey to
rê vat. Diyini: mi biray xo
qewirna, mi xeletey kerdî.

Birazay mi ame mi ver a xo
eşt merg. Hîrênî: mi to rê
bol xizmet kerdbî, fina to
qedrê mi zey jew kavirî nê-
zana. To waşt kendir mi
qirri kerê, mi dar di kerê.

Merdimê hukmatî ra bawer-
biyayîş zî xeletey a. Şî-
rêtê kalî heme rast viciyay.

Padişaya poşman bi, va:
- Ez o to 'ef bika, ti fina
Wezirîya mi biki.

Wezirî ageyra, va: -Keso ki
qedrê mi henda jew kavirî
nêzano ez ci rê wezirîyê nê-
kena. Ez nika ra tepya şî-
retanê kalî tepişena*.

* Na mesela 1979 di zey
vatişê yew dewijê qezay Alduş
(Gerger)'î nusiyaya.

Alduş: yew qezay wilayetê.
Semsûr(Adiyaman)'î yo.

Xeco

Xec' Xeco, Xeco, Xeco!*
Xec' Xeco, Xeco, Xeco!
Bê ma şêrî eno het a,
Awka birdê ma nobet a.
Yew gilanga mi Xeco'y het a,
Xeco na ra cinabet a.
Şarî ma ser o veta,
Deyri niya ki zerbet a.

* Na deyri zey vatişê Nuriyê Gêlîjî nusiyaya (Gêl: yew
nahîyey Diyarbekir o).

Şîretê Kalî

Arêkerdax: Malmîsanij

M. Şêxo di nav gulan de hat veşartin



Gele Kurd wezifa xwe ya dawîn ji bo Mihemed Şêxo bi cî anî

Dengbêjê bi nav û deng Mihemed Şêxo di 10.03. 1989'an de li Kurdistana Suriyê li bajarê Qamişlo ji ber nexweşiya xwe ya kezebê çavên xwe li jiyane girt û ji dinê bar kir. Piştî bihîstina mirina M. Şêxo ge-lê Kurd bi partî û rêxistinên xwe, bi kal û ciwanên xwe, bi mêr û jinên xwe, bi xwendevan û xortên xwe, bi piçûk û mezinên xwe ve nêzikî 10 hezar kes li pey wî meşyan. Di me-şê de bi yek dengî şiarên wek "Bavê felekê namire", "M. Şêxo namire", "Bijî

Kurdditan" dihat avêtin. Cenazê M. Şêxo li goristana Hilêliyê bi dilan, girîn û hawar, bi stran û şîaran hat veşartin.

Di dema veşartinê de, çend welatperwerên Kurd li ser jiyana M.Şêxo axaftin. Yek ji axaftvanan jî Dengbêj Seîd Gebarî bû. S. Gebarî di axaftina xwe de li ser jiyana M. Şêxo sekinî û axaftina xwe wiha qedand: "M. Şêxo bi hemû tiştên wî yê welatperwerî ve di nava dilê xwe de veşêrin. Bi baxê gulana gora wî bixem-lînin û bikin seyrangê û

ziyaretgeha welatperweriyê û hunermendan".

Di dema veşartinê M. Şêxo de, kasete wî dabûn ser teybê û M. Şêxo bi dengê xwe yê melûl û xemgîn distira û digot: "Ey felek bo te dinalim bo çi nêrgiz çilmisî, ev çima bextê me ho ye em bê dost û bê kes in".

Piştî veşartinê M. Şêxo herkesî behsa bê wextiya mirina wî dikir. Digotin "ew zû çû, hîn wê gelek xizmet ji bo doza gelê Kurd û muzîka Kurd bikira".

Bavê Keser Qamişlo

Konferansa Navnetewî ji bo Mafên Însanî li Kurdistanê

Destpêk r. 1

Di Konferansê de axaftina Parlamentera Partiya Keskan ya Almanya Petra K. Kelly balkêş bû. Ew bi taybetî li ser bikaranîna çekên kîmyayî ku rejîma Iraqê li dijî Kurdan li Helepçe bi kar anî sekinî û wiha got: "Li Parisê kesên ku bikaranîna çekên kîmyayî rûşekirin, ji hêla din jî piştigiriyê qatîlên gelê Kurd kirin". Patra Kelly di axaftina xwe de navên 24 şirketên Almanî eşkere kir ku li dijî Kurdan, di bikaranîna çekên kîmyayî de rol listine. Di dawiya axaftina xwe de wê, bangî dewletên ku alîkariya eskerî û aborî didin Tirkîyê, Iraqê û Îranê kir ku ew alîkariyê nedin van devletan. Ji ber ku ev dewlet li dijî gelê Kurd politikayek zordarî dimeşînin.

Her wiha di Konferansê de li ser pirsên cur be cur yê gelê Kurd hin komîsyon jî hatibûn avakirin û li ser navê van komîsyonan jî hat axaftin. Kesên ku li ser navê Komîsyonan axaftin ev bûn:

Di Komîsyona "Çanda Kurd û Mafên Mirovî" de:

Prof. Dr. Antje Katrin Menk,

Dr. J. Meyer Ungwersen: (Li ser babeta "Çanda Kurda û Huwiyeta Kurda")

Ferhad Shakely: (Li ser babeta "Edebiyeta Kurda")

Huseyin Erdem- Sekreterê Kluba Penê ya Kurd: (Li ser babeta "Edebiyeta Kurda")

Dr. Phil. Tove Skutnabb Kangas Unîversîta Roskilde-Danîmarka

Prof. Robert Phillipson- Unîversîta Roskilde-Danîmarka

(Ev herdu kes li ser babeta " (Linguistik) Mafên Mirovayî û Zimanê Kurdî")

Christian Rumpf : (Liser babeta " Qanûna Qedexkirina Zimên)

Dr. Mirella Galetti (Rojnamevan-Kurdolog) Bologna-Italya: (Li ser babeta "Kurd û Mafê Agahdari")

Antje Katrin Menk-Unîversîta Bremenê

Budo Buchner (Awuqat)-Tubingen-Almanya Federal

Di Komîsyona "Parastina Mafê Jiyana û Heysiyetê" de

Jurgen Roth: Nivîskar-Rojnamevan: (Li ser babeta "Li Kurdistanê tatbiqatên eskerî")

Herbert Klein (Li ser babeta "Îşkence û rewşa girtiyên politik")

Hans Werner Odendahl-Awuqat: (Li ser babeta "Tebîrên Îdarî" (Orfî Îdare û Waliyê Herêmî)

Ute Baran-Sosyolog: (Li ser babeta "Nefîkirin" (Qanûnên Tûncelî)

Dr. Lale Yalçin (Etnolog) : (Li ser babeta "Jina Kurd û Huwiyeta Netewî")

Ali Bûciak -Awuqat: (Li ser babeta "Kurd û Qanûnên Cezayiyên Tirk")

Gert Bastian-Generalê Te-qawût: (Li ser babeta "NA-TO û Kurd")

Di Komîsyona ("Rêxistinên Navnetewî, Peymanên Navnetewî û Pirs Kurda") de

Vera Beaudin: (Li ser babeta "Programa Kurd-New York (New York Times-Kurdish Times)

Feliks J. Bister-Cîgirê Serokê Lîga Mafê Mirovî ya Awusturya: (Li ser babeta "Li Ewrûpa Têvgerên Mafê Mirovî û Kurd")

Wolfgang Von Nostitz-Endamê Parlamentoya Ewrûpa: (Li ser babeta "Parlamentoya Ewrûpa Pirs Kurda")

Pelle Voigt-Parlamentê Danîmarka: (Li ser babeta "Di Beyana Nihayî ya Hel-sînkî ya 1975'an de Mafê Mirovî û Kurd")

Sertac Bucak: (Li ser babeta "Kurd û Qedera Tayinkirina Mefên Netewî")

Huseyin Sado-Hakim: (Li ser babeta "Rêxistina Nete-wên Yekbûyî û Pirs Kurda")

Konferans li ser Proja GAP'ê

Dr. Erhard Franz-Enstîtûya Orienta Alman

Dr. Einhard Schmidt-Unîversîta Dortmundundê

Di Komîsyona "Multeciyên ku ji Iraqê hatin Tirkîyê" de

Dr. Ferhad İbrahim: (Li ser babeta "Di destpêka şerê navbera Iran û Iraqê de heta îro Pirs Kurda")

Hişyar Zibarî: (Li ser babeta "Windabûna 8000 Kur-dên Barzanî")

Prof. Aubin Heyndrickx: (Li ser babeta "Bikaranîna Çekên Kîmyayî li dijî Kur-dan û Konvansiyona Cenevre yê ya 1925")

Di Panelê de ji evan kesan axaftin:

Hans Branscheidt Mediko Înternasyonal-Frankfurt

Heidi Alm-merk- Parla-menterê Eyaleta Hannover

Hennes Kempmann-Parla-menterê Eyaleta Hannover

Sabine Baun (Rojname- van) Hannover

Berit Eriksson-Parlamen- tera Swêd

Barbara Noack-Palamen- tara Eyaleta Bremen

Paul Tiefenbach-Parla- menterê Eyaleta Bremen

Gyin Robert (Rojname- van) London

Di dawiya Konferansê de civînek çapemenî hat çêkirin û agahdarî di derheqê Konferansê de hat dayin. Konferansê di dawiyê de belavokek belav kir ku daxwazên jêrîn tî pêşkêşkirin.

● Rêxistina Netewên Yekbûyî, li ser bingeha qaidên hûquqî yê navnetewî ji bo helkirina meselê, prensîpa wekhevîya mafî ya miletan û ya tayinkirina qedera xwe bi serbestî, divê zûtirîn wext, rewşa Miletê Kurd bigre rojeva xwe.

● Dewletên endamê Konfeyansa Ewrûpa û yê Konfeyansa Ewrûpa ji bo Ewlekarî û Hevkarî ku Tirkîyê jî endamên wan e û her wiha Civaka Ewrûpî ya Aborî ku Tirkîyê daxwaza endametiye lê dike, divê zorê bidin hukmeta Tirkîyê ku berpirsyariyên xwe yê ji peymanên navnetewî dertên bi cih bîne û ihtirama mafên mirovayî bigre.

● Dewletên ku ji bo çareserkirina nakokiyên Rohilata Navîn li riyek aştî digerin, dibê hewl bidin ku mesela Kurd di civînek navnetewî ya pêşde ji bo Rohilata Navîn cî bigre û nimî-nendên siyasî yê Kurdan jî di vê Civîna Aştî ya Navnetewî ya Rohilata Navîn de beşdar bin.

● Sekreterê Giştî yê Netewên Yekbûyî û hemû hêzên ku dixebitin hellek adil pêk bê piştî Şerê Delavê Basra, divê hewl bidin ku nimî-nendên gelê Kurd jî di wan xebatan de beşdar bibin ku ji bo vê armancê pêk tînin.

● Welatên Endustrî, ta ku mafê insanî li Kurdistanê bi cih bibin, divê alîkariya xwe ya leşkerî û malî ji Tirkîyê, Îran û Iraqê bibirin.

● Hemû kes û mueseles divê êrişên ser gelê Kurd, hewldanên ji holê rakirin û tunekirina tarîx û hebûnên wî yê kulturî û huviyeta wî ya milî, surgunkirina ji welatê wî û belengazkirina wî, protesto bikin, xebat bikin ku kesên surgûnkirî veşerî cih û warên xwe, aqîbeta yê wendabûyî bê diyarkirin û ew kesên ku ji Kurdistana Iraqê penaberî Tirkîyê bûne, mafên multeciyên li gor Konvansiyona Cenevrê pêkhatî werbigirin, hukmeta Tirkîyê vê statuya multeciyê qebûl bike.


● Divê mafên ziman û kulturî yê Kurdên ku li derveyî Kurdistan dijîn û eqliyeta penaber in bê garantîkirin, hukmeta divê tedbiran bistîne ku kultura Kurdî bê parastin, zimanê Kurdî di hindekariyê de, di dîpemenî û tîkiliyên resmî de bê bikaranîn.

● Konferansê pêwîst dibîne ku ji bo çavdêriya rewşa gelê Kurd û agahdariya li ser pêpeskirina mafên insanî yê Kurdan, rêxistinek bê danîn ku ji hukmeta û dewletan serbixwe (non-govermental) be.

Konferans biryar dide ku "Deklerasyona Bremenê li ser Rewşa Mafê Mirovayî yê Kurdan" di rîya "Însiyatîfa ji bo Mafên Mirovayî yê Kurdan" re bê şandin ji bo Sekreterê Giştî yê Netewên Yekbûyî, Konseya Ewrûpa, Civaka Aborî ya Ewrûpa, Serokê Parlamentoya Ewrûpa, serokên hukmeta û dewletan û muese-sên navnetewî.

X a ç e p i r s

Amadekar: S. Rêving



Çeperast: 1-a) Bajarek li Kurdistana Iraqê ku hukûmeta Be'esi di 24'ê Nisana 1974'an de dabû ber bombên napalm û 400 Kurd şehîd bûbûn, b) Qiymet, biha. 2-a) Nanê ku di cejna de çêdikin. Qasî sandewîça ye, di nav de penêr an goşt, carna ji kakilê gûza heye (berevajî), b) Dem, wext. 3-a) Heywanekî zirav û dirêj e, hinek curên wan bi jehr in, b) Li devera Mergeverê ji "qût"ê zivistanê re dibêjin. 4-a) Belê, e, b) Bexşîn, lêbûrîn. 5-a) Kesê di karekî de şehreza, zanayê karekî, b) Girêka ji bo şidandina barê li ser dewaran li werîsa didin (berevajî). 6-a) Rih, b) Gep, loqme, c) Cihê genim lê dihêrin, dikin ard. 7-a) Pronava îşarkî ji tiştên

mê, b) Meriv pê porê xwe rast dike, c) Tenayî, rehetî. 8-a) Dûmahî, "paşî", b) Nexweşiya ku ji yekî derbasî yekî din dibe. 9-a) Têlek ji porê meriv (berevajî), b) Gotineke îşaretkirinê. 10-a) Vajiya "girî" yê (be revajî), b) Cêrê mezin yê avê (berevajî). 11-a) Li Kurdistana Îranê ji "şekir" re dibêjin (berevajî), b) Perçek ji laşê meriv. c) Ne, nexêr (bere-

vajî). 12-a) Paşgira da-çekê (berevajî), b) Bawerî.

Serejêr: 1-a) Bac, wergî, b) Zurîyet. 2-a) Karê paqî- kirina giyayên biyanî ji nav zevîyan (berevajî), b) Qehremanê çîrokeke folklorî ya bi nav û deng. 3-a) Tembêl, sist û xav, xemsar (bere- vajî), b) Bi Kurmanciya jêrî "av". c) Sînonîmek ji bo "ku". 4-a) Li hin mintiqan dayik ji bo xuyakirina bi qirêjî an pîsîtiya tiştan ji zarokên biçûk re dibêjin, b) Sala çûyî (berevajî), c) Kesê têhnî, yê avê dixwaze (ber- vajî). d) Hiç, ebeden. 5-a) Hejmarek, b) Mirovê dil- xweş, yê kamûran (bereva- jî). 6-a) Pirsîyarek (bereva- jî), b) Ji koma heywanên kovî re dibêjin. 7-a) Zarava- yekî zimanê Kurdî, b) Ax, toprax (berevajî). 8-a) Têjîkê xezalan, b) Dewarek (bereva- jî), c) Baneşanek. 9-a) Berxi- kê biçûk û zeyîf mayî (bere- vajî), b) Navê rojekê (bere- vajî). 10-a) Gotineke gazî- kirinê, b) Çemekî di navbe- ra Kurdistanê û Sovyetê de, her weha navê kuran e jî. 11-a) Navê darekê, b) Nexwe- şiyek (berevajî). 12-a) Dara bê ber, ya bê fêkî, b) Navê qezayê Sêrê.

Bersîva hejmara berê

Çeperast: 1-a) Newroz, b) Xelat. 2-a) Na, b) Orîn, c) Deve. 3-a) Lis, b) Zê, c) Dehaq. 4-a) Pêt, b) Genî. 5-a) Tes, b) Re. 6-a) Hawargeh, b) Ard. 7-a) Ewr, b) Perde. 8-a) Le, b) Ba, c) Sarma. 9-a) Ala, b) Terî. 10-a) Beyar, b) Ap, c) Ke. 11-a) Çav. 12-a) Evê, b) Birindar.

Serejêr: 1-a) Nalî, b) Helepçe. 2-a) Enî, b) Tawe. 3-a) Stewr, b) Ay. 4-a) Ro, b) Asê, c) Alav. 5-a) Pêro, b) Rê- bar. 6-a) Ziz, b) Ga, c) Çi. 7-a) Şape, b) Ar. 8-a) Derhem, b) Avî. 9-a) Edene, b) Pîrr. 10-a) Lehî, b) Adar, c) Dê. 11-a) Ava, b) Keser. 12-a) Teq, b) Di, c) Têvr.

Çin:

Xwendevanên Unîversîtê Daxwaza Demokrasiyê û Azadiyê Dikin

Piştî mirina serokê PKÇ yê berê Hu Yaobang mîtingên xwendevanên unîversîtê roj bi roj zêdetir dibin. Xwendevan daxwaza demokrasiyê hîn firehtir û azadiyê hîn pirrtir dikin

Piştî mirina serokê Partiya Komunîst a Çînê (PKÇ) yê berê Hu Yaobang mîtingên xwendevanên unîversîtê roj bi roj zêdetir dibin. Ji aliyê din karkir û xebatkaran din jî ji bo ku nerazîbûna xwe ji siyaseta reformê ya PKÇ nişan bidin, dest bi mîtingan kirin.

Di vê tevliheviyê de bûyerên ne xweş jî dibin. Li bajarê Xiyan û Çangşa otomobîl hatine şewitandin û dikan hatine talankirin. Wisa tê gotin ku kesên ku dixwazin tevlihevî, şer, talan

û hin bûyerên ne xweş derxin ji hêzên bazara reş û krîmînel pêk tên.

Di esasê xwe de niha li Çînê yên ku guhertinên nuh dixwazin du hêz in. A yekem xwendevanên unîversîtê ne û yê din jî karkir û xebatkar in. Herdu alî jî di daxwaza maf û azadiyên demokratîk de digihjin hev û cara yekemîn di rojên 22 û 23'ê Nisanê de ji bo daxwazên xwe yên muşterek bi hev re li Pekîne mîtingek pêk anin.



Xwendevanên Unîversîta Pekîne di afîşên xwe de êrişê dibin ser serokê PKÇ, Li Peng û Ajansa Çîna Nû.

Fîşa abonetiya Armancê

- Salek
- Şeş Meh

Abonetiya salekê
120 Skr. 120 FF. 20\$ 35 DM

Tarîx:

Nav û paşnav:

Navnîşan:

Welat:

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgiroya jorê bişînin. Fotokopiya kvîtoya heqê abonetiye û fîşa jorin dagirin li ser adresa jêrin ji me re bişînin.

Adres: P.Box: 6004, 172 06 Sundbyberg/Sweden

NATO û DYA ne dilxwazê aştiyê ne

Hesen Mizgîn

Di 12'yê Nisanê de Wezîrên Karûbarên Derve yên endamên PW (Peymana Warşovayê) civîna xwe ya adetî çêkirin. Di civînê de biryara pêşniyara gotûbêja li ser çekên atomî yên menzîlkurt bi NATO'yê re hat qebûl kirin. Li gor biryara civînê gotûbêja li ser çekên atomî yên menzîlkurt doma peymanê INF ye.

Sekreterê NATO; Manfred Worne di bersîva xwe de wisa nişan da ku qet niyeta NATO tune ye ku bi PW re li ser çekên atomî yên menzîlkurt gotûbêjan bike.

Siyaseta çekdaxistinê ya Yekîtiya Sovyet tevgera aştiyê li hemû dinê geş kir. Bi vê siyaseta Yekîtiya Sovyet ew siyaseta şidyayî ku li hemû dinê tesîrêk piralî dikir roj bi roj ber bi nermbûnê çû û diçe. Tevgera perestroyka û glasnost jî bala welatên endamên NATO'yê kişand ser xwe û hin dewlet -wek Almanya Federal û Belçîqa- di beyanên xwe de eşkere kirin ku ew hew dixwazin çekên atomî ku li van welatên cîhkirî ne, bêtin nûjenkirin. Almanya Federal û Belçîqa ev daxwaza xwe di civîna NATO'yê de ya li paytextê Belçîqa; li Brukselê pêşkêş kirin û piştigiriya Norwêç, Danîmark, Spanya, Yunanîstan û Tirkîyê jî stendin.

Civîna NATO, di esasê xwe de li ser nûjenkirina çekên atomî yên menzîlkurt bû. Bi taybetî DYA û Brîtanya Mezin dixwazin ku wan çekên atomî ku li Ewropayê hatine bicikirin bêtin nûjenkirin. Piştî vê civîna NATO'yê ku di roja 20'ê Nisanê de pêkhat, Wezîrê Karûbarê Derve yê Danîmarkê Knud Enggaard eşkere kir ku li ser ne cudabûna nûjenkirina çekan û çekdaxistinê hevgerîdanek heye û di vê babatê de endamên NATO'yê wekhev difikirin. Lê belê DYA û Brîtanya cardin wek xwe kirin û pêşniyara PW dan redkirinê.

Wek tê zanîn piraniya fuzeyên atomî yên NATO li Almanya Federal hatine bicikirinê. Nuha muxalefeta li dij çekên atomî li Almanya Federal wisa xurt bûye ku koalîsyona hêzên rast jî mecbûr bûye ku guh bide vê muxale tî. Bi taybetî Wezîrê karûbarên Derve Ha

Dietrich Genscher li dij planên NATO yên nûjenkirina çekên atomî yên menzîlkurt radiweste. H. D. Genscher di peydakirina lihevhatinek di navbera PW û NATO'yê de, bi rastî jî rolek girîng dileyze. Ev rola H. D. Genscher ji alî seroktiya NATO'yê qet nayê heskirin û tîrsa wan ew e ku endamên din ên NATO jî li pey siyaseta Genscher herin.

Li gor DYA û Brîtanya Mezin, piştî peymanê INF a sala 1987, NATO jî alî fuzeyên atomî ve zeif ketiye û ji ber vê yekê jî divê fuzeyên atomî bêtin nûjenkirin. Eger NATO vê programa nûjenkirinê pêk bîne wê carek din ji herdu aliyên -him jî alî NATO û him jî alî PW- çekdarkirinek nuh dest pê bike û tu qîmeta Peymana INF jî namîne.

NATO dixwaze 88 îstasyona firandina 750 fuzeyên Lance ku dikarin 120 km bifirin, biguherîne bike 750 îstasyonên nuh û ên hin fuzeyên nuh ku dikarin 460-480 km. bifirin. Ev guhertina ha wê bibe gava pêşin a nûjenkirina fuzeyên atomî.

Di gava duemîn de NATO dixwaze fuzeyên ku ji teyareyên leşkerî tî avêtin û dikarin navbera 250-400 km dûr bifirin li Ewropayê bi cîh bike. Bi vê jî NATO dikare fuzeyên xwe bigihîne heya hundirê Yekîtiya Sovyetê. Hejmara van fuzeyan navbera di 1100 û 1300 de ye û wê li teyarên wek tîpên F-15 û F-16 têtin bi barkirinê. Li gor hin çavkaniyan, wê DYA jî îsal ve li Brîtanya Mezin 40 balafirên FB-111 bi cîh bike.

Di gava sêyemîn de -ev du sal in ku dest pê kiriye- NATO dixwaze topên xwe yên bi bombeyên atomî biguherîne û nûtir bike. Ev topên nuh bombayên xwe bi mesafeyek dirêjtir diavêjin, çapa wan mezintir û lûleyên wan dirêjtir in.

Yekîtiya Sovyet û endamên PW carek din destên xwe yên aştiyê dirêji DYA û NATO kirin. Pêşniyara YS û PW di her alî de çekdaxistin e. Lê wisa xuya ye ku herçiqas argumentên DYA û NATO'yê ji alî YS û PW hatin pûçkirin jî DYA û NATO dev ji niyeta xwe ya "nûjenkirinê" bernadin.

Di Komîta Merkezî ya PYKS de guhertinek mezin çêbû

110 endamên Komîta Merkezî ya Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyet bi nivîsek muşterek serî li Komîta Merkezî (KM) dan û azadiya xwe ji vatîniya xwe ya îro xwestin. Nivîsa 110 endamên KM ji alî Mihail Gorbaçov ve hat pêşkêşkirin û hat beyankirin ku daxwaziya 110 endaman ji alî KM ve hatiye qebûl kirin

Di presskonferansa ku di 26'ê Nisanê de hat pêkanîn, berpirsiyarê karûbarên îdeolojîk ê Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyetê (PYKS) Vadim Medvedev eşkere kir ku 110 endamên ku îstifa kirine, piştigiriya xwe bi siyaseta reformê ya PYKS, ango bi perestroykayê pêşkêş kirine. Heya nuha di Komîta Merkezî ya PYKS'ê de 301 endam hebûn lê ji nuha pê ve wê ev hejmar bibe 251.

Mihail Gorbaçov di axaftina xwe de got ku ji bo kar û barên ku li hember Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyet hene, bi awakî tundî bêtin kirin, di nav partyê de guhertina kadiran pêwîst e.

Di nav 110 endamên ku îstifa xwe dane Wezîrê Karûbarê Derve yê YKSS ê berê û Serekê Dewletê yê kevn Andrey Gromiko, berpirsiyarê personelan Mihail Solomentsev, Serokwezîrê berê Nikolay Tixonov û Serokwezîrê Duemîn ê berê

Vasiliy Kuznetskov û Haydar Aliyev jî hene.

Di dawîya axaftina xwe de Mihail Gorbaçov got: "Jiyan dom dike. Ji bil guhertinên aborî, civakî û siyasî, guhertina şeşsan ji di nav perestroykayê de ye".

Di komentarên xwe de çapemaniya Rojava guhertinê di nav Partiya Komunîst a Yekîtiya Sovyet de bi xurtbûna rewşa Mihail Gorbaçov didin diyarkirin.